



Li ser awayê mîmariyê tesîra siruştî zehf e. Ev xaniyên li Deştê Heranê jî vê yekê didine nîşan. Taybetiyeke van xaniyan jî ev e: Di qêleqija havînê de jî hundirê wan hênik e.

'EM ŞAGIRTÊN HUNERÊ NE'

Koma Çiya ku bi kasetê xwe ya duyemîn (Dîlana Bêsînor) silav li muzîkhezan kir, xwe wisa bi nav dîke



Tirkiye li hundir û li derve têt diçe

● Rûdanên hefteyekê bi tenê jî rewşa Tirkiyeyê bi awayekî zelal diyar dîkin. Li aliyekî hikûmet dîkeve, karker didin zanîn ku êdî ew naxwazin barê şerê kirêt bikişînin, li aliyê din çalakîyên aşîxwazan gur dibin û PKK amadekariya agirbesteke nû dîke.

● Li derve jî hemû saziyên demokratîk daxwaza guherînê bîngêhî dîkin. Doza kurdî li seranserê dinyayê tê nîqaşkirin. Li Kongreya Amerîkayê meseleya kurdan hate gengeşekirin, li Norwecê civînek li ser kurdan li dar dîkeve.

Rûpel 2

● Em zêdetir li ser formên otanîk ên muzîka kurdî disekin. Li ser wan forman stranên çêdîkin. Ritman jî her wisa jî xwe re dîneqînin. Lê divê bê gotin ku, em dixwazin wan bi awayekî nû binîne zimên. Ji bo me ritm, maqam zehf girî in.

● Rîtmên 12/8, 9/8, 5/4, 3/4 û hwd. kêr hatine bikaranîn. Gelek kes û kom, stranên li ser çer notayên dibêjin. Rîtmên hêsan (basît) dixebitînin. Me dil heye ku em usûlên tevlihev û giran, rîtmên leng û kulek bi kar binin, di xebatê berhemên xwe yên nû de me ev yek daye ber xwe.

● Em dixwazin wekî dengbêjan li ser rewşa gelê xwe berhem biafirînin. Vê qonaxa ku gelê me tê de dijî em dixwazin bi riya muzîkê binîne ziman. Em naxwazin bi tenê stranbêjiyê bikin. Her wisa em dixwazin di vî warî de xwe bihêvojin.

Rûpel 8-9

DÎROK

Girîngî siyasî û mêtuy Şerefname bo xebatî istay gelî kurd

Şerefxan nek tenha mîr û fermarewa bû bê belku mirovêkî birwurd û berçavrun û runakbîr buwe. Asoy frawanî birî şûrî destelatî mirayetî bezanduwe. Ew peywendî nadiyarî rudawekanî pêkewe bîniwe. Le fermanar û helsengandan da babetî durbin buwe û cilewî soz û endêşey berda nekirduwe.

Rûpel 7

DÎPLOMASÎ

Kontra kurdî li Kurdistanê eşkere bû

Ttunekirina serhildanan dixwaze ku herêmên gerîla biçûk bike, da ku nêzikî di nav PKK'ê û kurdên Başûr de çênebe û şoreş li vê derê cihê xwe negire. Her wiha jî CIA dixwaze bi kontra kurdî re vê derê bike navenda tevgera li dijî şerê serxwebûnê.

Rûpel 5

CIVAKÎ

Dewleta alman û tirk şîrikê vî sûtî ne

Parlementera PDS'ê ya Eyaleta Saksonyayê Barbara Knöfler: "Piştî ku em herin Almanyayê, li dijî çekfirota alman ji bo Tirkiyeyê emê kampanyayên xurt amade bikin. Emê bikevin nav xebateke anti-mîlîtarîst ji bo ku em rûyê wan ê reş derînin holê."

Rûpel 16

ÇAND

Xelatên şehîdan hate dayîn

Encama musabeqeya Xelatên Musa Anter û Şehîdên Çapemeniyê ya sêyemîn diyar bû. Musabeqe îsal ji aliyê rojnameya Yeni Politikaya ve hate lidarxistin. Di 20'ê rezberê de, li Stenbolê, li Navenda Çanda Mecidiyeköyê bi beşdariyê mezînan, kesên ku xelat qezenc kiribûn, xelatên xwe wergirtin.

Rûpel 13

Tirkiye li hundir û li derve têt dîçe

Rûdanên hefteyekê bi tenê jî rewşa Tirkiyeyê bi awayekî zelal diyar dikin. Li aliyekî hikûmet dikeve, karker didin zanîn ku êdî ew naxwazin barê şerê kirêt bikişînin. Li aliyê din çalakîyên aştiwazan gur dibin û li Başûr gelek der dikevin bin kontrola gerîla, PKK amadekariya agirbesteke nû dike. Li derve jî hemû saziyên demok daxwaza guherînên bingehîn dikin. Gelemşeya kurdî li seranser dinyayê tê nîqaşkirin.

Dema mirov rûdanên ku di nava hefteyekê bi ber çavan re derbas dike rewşa Tirkiyeyê diyar dibe. Hikûmeta CHP û DYP'ê ku gelek nav dest guherîn, piştî 4 salan ket. Dema ketina hikûmetê gelek girîng e, li aliyekî Dadgeha Bilind doza mebusên DEP'ê hildide ku ji bo yekitiya gumruk pir muhîm e.

Li aliyê din PKK daxwaza raya giştî ya Tirkiye û navneteweyî digire ber çav û amadekariya agirbesteke nû dike. Mercên hundir û derve ji bo agirbestekê musaîfê dîtin, lewre jî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan roja 18'ê rezberê daxuyaniyek bi telefonê da MED-TV'yê û daxwaza rêxistina xwe ji bo agirbesteke nû diyar kir. Tê gotin ku wê Öcalan di 25'ê rezberê de bi telefonê beşdarî programeke zîndî ya MED-TV'yê bibê û pirsên rojnamegeran li ser vê mijarê bibersivîne.

Li gorî agahiyan wê Öcalan di vê programê de agirbestê diyar bike. Tê gotin ku heke dewleta tirk rasterast agirbestê nepejirîne jî nikare bi ser gerîla ve biçê, ji ber ku tişteki wisa wê reaksiyona raya giştî bikişîne.


Brûskê li civîna Dublinê xist

Wekî tê zanîn daxwaza aştiyê di nav kurd û tirkan de gelek bilind bûye. Êdî malbatên leşkeran jî wê daxwazê fînin zimên. Wekî mînak helwesta jina albaya ku li Stêwrê hate kuştin Tomris Özdenê tê nîşandan. Tomris Özdenê piştî kuştina merê xwe bi daxuyaniyên xwe yê aştiwaz bal kişand ser xwe, Özdenê di 1'ê rezberê de bi destê xwişka gerîlayê ARGK'ê Xebat, Emine Dumanê girt û daxwaza aştiyê anî zimên. Li

hemberî wê helwestê, berdevkên kontr-gerîla êrîş anîn ser wê. Bi vê yekê kontrayan dixwest wê ji riya aştiyê dûr bixin, lê wê êrîşê berevajî encam da. Her çiqas CHP'ya ku delegeyên wê bi 572 dangan ew kiribûn endama meclîsa partiyê lê xwedî derneket jî, derdorên aştiwaz li nik Tomris Özdenê cihê xwe girtin û kontra û berdevkên wê teşhîr kirin. Her wiha 1'ê Rezberê ango Roja Aştiyê bi çalakîyên berfireh hate pîrozkirin, gelek sazî û partiyên demokratîk daxwaza aştiyê diyar kirin. Hê jî ev çalakî berdewam in. Wisa dixuya ku êdî karker jî naxwazin barê şer bikişînin. Vê yekê jî bi livbazîyên xwe nîşan didin, heftiya çûyî bi sed hezaran karkerî dest bi grevê kirin.

Her wiha li derve jî plan û tevdirên Tirkiyê têt dîçin û derdorên demokratîk rexneyên tûj li Tirkiyeyê digirin. Civîna Dublinê ya duyemîn bencam qediya. Di vê civînê de

Tirkiye û Amerikayê dixwest herdu partiyên Başûr (YNK û PDK) bajon ser PKK'ê, lê YNK'ê ev tişt qebûl nekir. Bi awayê ku derdorên siyasî dibêjin, "brûskê li wê planê xist." Li Başûr hilpişkîna brûskî didome û herêmên nû dikevin bin kontrola gerîla. Piştî civînê tirkîliyên YNK'ê û dewleta tirk xerabtir bû. Serokê YNK'ê Celal Talabanî her çiqas dixwaze tirkîliyên xwe bi Tirkiyeyê re baş bike jî, helwesta nûnerên tirkan rexne dike û dide zanîn ku Tirkiyeyê çek dane PDK'ê. Ji bilî wê jî, Parlamentoya Ewropayê jî bo tesdîqkirina yekitiya gumrukê berdana kesên ku ji ber ramanên xwe hatine girtin, bi taybetî jî mebusên DEP'ê dixwaze. Dîsa Rêxistina Efüyê ya Navneteweyî (AI) bi raporekê rexneyan li hikûmeta tirk digire û wê li ber geşedana demokrasiyê wekî astengekê bi nav dike. AI di vê rapora ku roja 20'ê mehê daxuyand de ji Tirkiyeyê van tiştên bin-



Abdullah Öcalan

gehînxwaze:

* Rakirina madeya 8'an a Zagona Antî-terorê û berdana kesên ku ji ber dîtinên xwe hatine girtin.

*Îmkana dîtinê hemû kesên di bin çav de, ji bo ku rê li ber îşkenceyê bê girtin.

*Kurtkirina dema di bin çav de mayîne ji bo ku rê li ber îşkence û windabûnan bê girtin.

Li Kongreya Amerikayê agirbesta PKK'ê hat nîqaşkirin

Li aliyê din Komisyona Mafê Mirovên ya Weziriya Karê Derve yê Norwecê di navbera 22 û 25'ê rezberê de li ser meseleya kurdan civînekê çêdike. Tevî gelek rewşenbîrên kurd û tirk, Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya jî beşdar dibe. Beşdarbûna Kaya li ser navê parlemantoyê wekî nasîna Norwecê ya PKDW'ê tê nirxandin. Dîsa li Kongreya Amerikayê bi destê Komis-



Celal Talabanî

yonê Helsinki û REHE'yê roja 19'ê rezberê civînek der barê Tirkiyeyê de li dar xist. Di vê civînê de bi berfirehî li ser meseleya kurdan hate sekinîn. Endamê Kongreyê John Porter xwest ku Amerîka tirkîliyên xwe bi Tirkiyeyê re qut bike. Porter daxuyaniya Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ya ji bo agirbestê anî rojevê û xwest ku Amerîka zorê bide Tirkiyeyê da ku ew bersivê bide wê bangê. Di vê civînê de raporeke AKIN'ê (American Kurdish Information Network) hate belavkirin, di vê raporê de, tê gotin ku keştiya Tirkiyeyê noqî bin avê dibe. Tê xwestin ku Amerîka navbertiya nûnerên kurd û tirkan bike, ji bo wê yekê jî wekî gava yekemîn divê Amerîka PKDW'ê binase.

Serokê Komîsyonê Christopher Smith, da zanîn ku Tirkiye di nav buhrana mezin de ye. Smith got ku li Başûrê Rojhilata Tirkiyeyê wekî encama şer 17.500 kes hatine kuştin, aboriya herêma kurdan tarûmar bûye, 7 milyar dolar li artêşa tirk çûye, 2 hezar gund hatine şewitandin, bi milyonan mirov ji cih û warê xwe bûne. Smith gotina xwe wiha berdewam kir: "Mebûsên ku bi dengê gel hatine hilibjartin, niha di girtîgehê de ne û kesên wekî Yaşar Kemal jî nikarin bi serbestî bipeyivin. Lewre jî divê Amerîka tirkîliyên ku bi Tirkiyeyê re dimeşîne di ber çav re derbas bike."

Piştî Smith çend kesên wekî jî Şaxê Karê Derve John Shattuck, Marshall Adair, ji Instutiya Lêkolînên ji bo Rojhilata Nêzik Alan Makovsky di axaftinên xwe de tevî hinek rexneyan piştigiriya Tirkiyeyê kirin. Di civînê de axaftina dawîn ji Çavdêriya Mafên Mirovan (Human Right Watch) Christopher Panico da zanîn ku li Tirkiyeyê du celebên demokrasiyê hene; li Başûrê Rojhilat mafê derbirinê nîn e û kontr-gerîla rewşenbîrên kurd direvîne û dîkujê.

**SAMÎ BERBANG
KANÎ XULAM**



Hemû buyerên ku rû didin têtçûna dewleta tirk diyar dikin.

Li Girtîgeha Bucayê qetlîam

Hêzên dewletê roja 21'ê rezberê li Girtîgeha Bucayê êrîş birin ser dîlên siyasî, di wê êrîşê 2 dîl hatin kuştin, nêzî 50 kesî birîndar bûn. Navên 2 kesên ku hatine kuştin: Turan Kılıç û Uğur Sariaslan in û her du jî ji doza DHKP/C'ê bûn. Li gorî gotina dixtorekî hêzên dewletê nehiştine birînen dîlan bê derman kirin û birîna gelek birîndaran giran e, îh-

timal heye ku 10 dîlên din bimirin. Serokê ÇHD (Komeleya Hiqûqvanên Nûjen) a İzmirê Levent Tüzel rayedarên dewletê berê îşareta wê êrîşê danê.

Berî bûyerê bi hefteyekê dîlên Girtîgeha Bucayê bi daxuyaniyekê kirînen rayedarên girtîgehê protesto kiribûn û bal kişandibûn ser îhtimala bûyerê wisa. Ev Daxuyaniya ku ji aliyê hemû

dîlên welatparêz û şoreşger ve hatibû îmze kirin, dide zanîn berî 40 rojî hêzên dewletê êrîşek pêk anîne, di wê êrîşê de 59 dîl birîndar bûne, lê tedawiya wan nehatiye kirin. Li gorî daxuyaniyê hemû mafên wan hatine xesp kirin û di riya mehkeme û nexweşxaneyê de îşkence li wan tê kirin. Saziyên demokratîk ev qetlîam protestokirin.

KEMİN ÇOLAŞAN DİSA ERİŞİ TOMRİS ÖZDENÊ KIR



Leşker canê xwe dispêrin şîrketên sîgortayê

Pêncûçar şîrketên sîgortayê dan zanîn ku poliçeyên sîgortayê herî zehf li Kurdistanê tê firotin. Bi piranî leşkerên li Şirnex, Culemerg û Dersimê serî li vê çareyê didin. Xebatkarê şîrketê sîgortayê dide zanîn ku çavûşên profesyonel û astsubay hêj di destpêkê de jiyana xwe sîgorta dikin û hin leşker hene ku 2-3 caran jiyana xwe sîgorta kirine.

Haluk Gerger cezayê xwe qedand

Rewşenbîr Doç. Haluk Gerger piştî 20 mehan roja 23'yê rezberê ji girtîgeha Haymanayê derdikeve. Gerger yek ji wan kesên ku ji ber bîr û baweriyên xwe hatiye cezakirin e. Haluk Gerger ji ber ku nameyek şandibû şeva bîranîna Deniz Geşmiş li gorî zagona ant-terorê bi 20 mehan hatibû sizakirin. Doç. Haluk Gerger ji ber hinek nivîsên xwe hîn jî tê darizandin.

Tawanbarên ramanê berdin

Gurûbê Kesk û Sosyalistan ên di Parlemantoya Ewropayê de daxwaznameyek li ser Mehdî Zana dan parlemantoyê û jî Tirkiyeyê xwestin ku tevî Zana hemû tawanbarên ramanî berdin. Mehdî Zana ji ber di civîna komîsyoneke parlemantoyê de axaftin kiribû hatiye cezakirin. Tê xwestin ku bo Mehdî Zana hemû riyên diplomatîk bî ceribandî.

Hüsnü Cankaya jî winda bû

Hüsnü Cankaya di 25'ê gelawêjê de li Barıştepeya Midyadê hate girtin. Roja 12'yê rezberê ew birine mehkemeya Midyadê, lê malbata wî heta niha tu agahî bi dest nexistine. Her çiqas bavê wî du caran serî li mehkemeyê xistibe jî, dozger gotiye ku wan Hüsnü berdaye. Li ser vê yekê birayê wî, Abdullah Yağız serî li İHD'ya Edeneyê da, xwest ku Hüsnü Cankaya bê dîtin.

Ji bo aşiyê kampamyaya înzeyê

Komeleya Mafên Mirovan (İHD) jî bo aşiyê dest bi kampanyaya înzeyê kir. Li gorî agahiyên ku ketin destê me İHD hêvî dîke ku di nava du mehan de li Tirkiye û derve 2 milyon înzeyî berhev bike û jî meclîsa tirk re bişîne, da ku doza kurdî bi rîya siyasî çareser bibe. İHD tevî vî kampanyayê wê hinek çalakîyên din jî bike.

Welatê Me / Çukurova

Edene li şehîdê xwe xwedî derket

Cendekê Seyfettin Kalanê ku di 3'ê rezberê de li Neumünstera Almaniyayê ji hêla faşîstên MHP'yî ve hatibû kuştin, piştî 10 rojan li Edeneyê hate binaxkirin.

Cenaze roja 14'ê rezberê bi rêberiya heyeteke alman ku parlementerê PDS (Partiya Sosyalizma Demokratîk) Barbara Knöfler jî di nav de bû, hate Stenbolê. Li gorî bernameya heyetê diviyabû roja 15'ê rezberê cenaze bihata Edeneyê. Lê belê di eynî şevê de cenaze ji hêla polîsan ve hate revandin. Malbata Kalan diyar kir ku polis dixwazin cenaze beyî merasîm bi beşdariya malbata wî bê naştin. Lê belê roja

15'ê rezberê tevî hemû hewldanên hêzên dewletê cenazeyê Seyfettin Kalan bi beşdariya 500 kesî li Goristana Burukê hate binaxkirin. Di dema vekirina tabuta şehîd Seyfettin de, derketina ala ERNK'ê ya mezin çokeke mezin da gel. Di definkirinê de jî bilî polîsên resmî û tîmên taybet, zêdebûna leşkeran bal dikîşand ser xwe.

Ji bo protestokirina kuştina Seyfettin Kalan, roja 10'ê rezberê li bajarê Berlînê 10 hezar mirovên kurd bi alên kesk û sor û zer û sloganên mîna "Bijî Serok Apo, şehîd namirin, Kurdistan ji faşîzmê re dibe goristan" meş û xwepêşdanek li dar xistibûn.



S. Kalan li Neumünster hatibû kuştin.

Seyfettin Kalan 23 salî bû û jî Gêncê Bîngolê bû. Kalan ev 2-3 sal bûn ku wek penaber li Almaniyayê di-

ma. Di 16'ê rezberê de heyeta alman li HADEP'a Edeneyê tevî rayedarên HA-DEP civîneke ji bo çar-

pemeniyê li dar xist.

Di civîne de parlementera PDS'ê Barbara Knöflerê diyar kir ku ew û hevalên wê Bernd Lange (endamê PDS û rojnameger) û Karina Gersser (endamê PDS) ji bo ku rê li ber astengiyên dewleta tirk bigirin bi cenaze re hatine. Wê got: "Lê belê helwesta hêzên dewletê ya nexweş hêj li Stenbolê dest pê kir, li Edeneyê jî hate definkirinê domkir." Li aliyê din jî Serokê HADEP'a Seyhanê Mustafa Karabulut û 5 rayedarên din jî di roja cenazeyê de hatin binçavkirin. Ev kirin jî ji aliyê derdora demokratîk ve hate protestokirin.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ EDENE

Rapora MIT'ê li ser Hatayê

Piştî ku gerîla li çiyayê Amanos bicih bûn, xebatên hêzên dewleta tirk li herêmê zêde bûn. Rêxistina îstixbaratê ya tirk (MIT) li ser xebatên PKK'ê li herêmê û tirkîyên wê bi erebên herêmê re raporên amade dîke. Di van raporên de tê gotin ku hinek ereb alîkariya PKK'ê dikin.

Li gorî agahiyên MIT'ê bi hatina PKK'ê dengê Artêşa Rizgariya Neteweyî ya Ereban ku di salên 1970'yî de çalakdar bû, ji nûve hatiye bîhîstin. Li gorî agahiyên

MIT'ê xebatên MHP û BBP'ê bandoreke berevajî armanca dewletê li ser gel kiriye. Tê zanîn ku ev her du partiyên faşîst ji bo ku nakokiyê di navbera kurd û ereban de derbixin xebatê dikin.

Dîsa di belavokên wan de rayedarên Suriyeyê tê tawanbarkirin, lê bi taybetî li Samandağê lêzîmên Hafîz Esad hene û ev propaganda nakokiyê di navbera wan û dewleta tirk de çêdike. Çavkaniyên MIT'ê îdia dikin ku PKK dixwaze di ser Ama-

nosan re derbasî nav Ene-dolê bibin. Li gorî nixandina MIT'ê dewlet xebata klasîk nikare rê li ber bi pêşveçûna gerîla bigire. Demeke dirêj e dewlet li van deran bi destê MHP û BBP'ê politikayên nijadperest dimeşîne û çekan li gundiyan tirk belav dîke.

Li aliyê din Waliyê Hatayê Utku Acun dixwaze sistema cerdevaniyê li herêmê bi cih bike. Li gorî agahiyên Acun roja 14'ê rezberê bi beşdariya 43 muxtar û 9 serokên belediyeyan ji bo vî

yekê civînek li navçeya Samandağê li dar xistiye. Tê gotin ku Waliyê Hatayê Utku Acun bi zîmanekî tehdîtkar ji muxtar û serokên belediyeyan xwestiye ku ew piştigiriyê bidin sistema cerdevaniyê, lê piraniya muxtar û serokan belediyeyan narazîbûna xwe li hemberî cerdevaniyê diyar kirine. Hinekan jî wan gotine ku ew dev ji gundê xwe berdî jî ew nabin cerdevan.

Navê 5 kesên ku di xaçepirsa hejmara 43'an de peyva veşarî 'HILPIŞKÎN' dîtine û kaseta Nilüfer Akbal "Mîro" qezenc kirine:

Kemal Aslan Midyad/Mêrdîn

Ehmed Zane Aliğa/Izmir

Nedim Yıldırım Kumkapı/Stenbol

Neytullah Aydemir Seyhan/Edene

Şefik Yaktın Yamanlar/Izmir

Parêzeriya mafê mirovan

Hin nîrxên navneteweyî hene ku mirov divê tev lê xwedî derdikeve. Heke li Kubayê an li Afrîkayê zordestiyek çêbibe, divê mirovahî lê xwedî derkeve. Lê gava ku li ber çavê te gelê kurd bê perçiqandin û fetisandin û ku tu bêdeng bimînî, tu vê zordariyê bipejirînî, kes ji te û parêziya te ya ji bo gelê Kubayê jî bawer nake.

Li Tirkîyeyê îro, ji ber ku mafên mirovan her gav binpê dibin, li dijî xwediyê van kirinan hin tevgerên alternatîf derketine holê. Di nav van saziyan de ya herî balkêş ku bi xebat û çalakîyên xwe di rojê ra ya giştî de cihe-

kî girîng girîtiye, Komeleya Mafên Mirovan (IHD) e.

Lê belê hin hêzên ku bi pêşveçûna tevgera azadiyê kefxweş nabin û ji bin bondara kemalîzmê xelas nebûne, gava ku ev sazî bi pîrsgirêka kurdî re eleqedar dibe, an jî, li wan kesên ku di vî şerê kirêt de pêkutî dîtine, zilm û zor dîtine, mafê wan binpê bûne xwedî derket, ew kes ji vê komelê vekîşyan. Wekî ku Serokê Giştî yê IHD Akın Birdal di hevpeyvîna ku bi İnönü Alpad re kiriye dibêje:

-Gava ku pîrsgirêka kurdî kete rojê me, me dît ku kî ji me dûr ketin. Di destpêkê de digotin humanîzm, mafê mirovan. Heta ku pîrsgirêka kurdî bi awayekî demokratîk, aştî, li ser bîngeha wekhevî û bira-



Ji ber ku mafê gelê kurd herî zehf tê binpêkirin, divê saziyên demokratîk pêşî li vî gelî xwedî derkevin.

tiya gelan çareser nebe, behsa mafên mirovan qet nabe. Wexta ku agir rûyê we dişewîtine, hûn dûr dikevin. Gava ku ew agir dibe xwelî hûn nêzik dibin. Bi vî awayî parêzvaniya mafên mirovan nabe...

Wekî ku Birêz Birdal jî dibêje bi dirûtiyê parêzeriya mafê mirovan nabe. Dilpaqijî û rastî divê. Tiştê ku xebatên vê komelê rûmeta wê zêde bike jî, wekî ku vê kome-

leyê û Sekreterê Giştî yê wê Hüsnü Öndül jî dibêje: "Wexta ku parêziya mafên mirovan bête kirin, divê ne li gorî reng, ziman, nîjad û ola mirovan be. Divê ji tevahiya mirovan re be.

Hin nîrxên navneteweyî hene ku mirov divê tev li wan nîrxan xwedî derkeve. Di vê çarçoveyê de, neheqiyek ku li gelê Kubayê be; li Afrîkayê zordestiyek çêbibe, li Çîn û Maçînê tiş-

tek çêbibe, divê mirovahî lê xwedî derkeve. Lê gava ku li ber çavê te gelê kurd bê perçiqandin û fetisandin û ku tu bêdeng bimînî, tu vê zordariyê bipejirînî, kes ji te û parêziya te ya ji bo gelê Kubayê jî bawer nake. Ji parêziya te ya yî Bosna û Çeçenîstanê jî kes bawer nake.

Parêziya Mafên Mirovan rastî û paqijiyê dixwaze.

M. BEDRAN BÊNAV

XAÇEPIRSA BIXELAT (43)

Ş	I	V	A	N	P	Ê	R	W	E	R
M	A	S	Î	L	A	V	Î			
X	A	T	Î	Ê	K	Ö	A	S		
N	I	V	Î	N	L	Â	L	Î		
H	N	A	R	Î	N	Ş	Î	N		
M	Î	N	A	E	S					
L	A	Î	N	W	Î					
Z	Û	Î	M	A	N					
C	Î	D	E	A	L	A				

PEYVA VEŞARÎ → HILPIŞKÎN

XAÇEPIRSA BIXELAT (45)

Cahil	Sembola Neteweyan	Çiya	Sewalek	Yê yekemîn
Hejmar	Cihê kayê	Rengê	Notayek	Kesê ji Iranê
7	Îrade	Sazkirina dengê ens	Notayek	Tolaz
Yê li kêleka bûka	1	Damezrê nerî	Di notayê de şekin	2
Tundruw			Mercêk	Zaravayekî kurdî
3	Paytêxa Asuriyan	6	Kinnivîsa Amerîka	8
O		5	Giraniyek	9
	Siyaset		Bir	
	Rexistîneke Başûrî	4	Bilindî	Kovareke bi kurdî
			Li Misrê Robar	
	Dersimî (wêne)	Li Amerîkayê rêzeçiya Enstrûman	Bersiva neyînî	10
			Plaga Polan	
			Qirêjî	
	Şoyî			Sembola Oksîjîne

PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

Xelata Xaçepirsê



Xelata hejmara 45'an,

Pirtûka Prof. Celîlê Celîl "Elê Newêrek Xatun Meymun" e.

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, em dinixînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tîn belavkirin. Ji bo ku bersiva we bê nîrxandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Kontra kurdî li Kurdistanê eşkere bû

Tunekirina Serhildanan (Counterinsurgency) dixwaze du armancan bi hev re pêk bîne: Yek guhertina civaka kurd li gorî daxwaz û berjewendiyên împeryalizmê, dudu ji hev cûdakirina gelê kurd û PKK. Ji bo guhertina civaka kurd, Berzanî di bin sîwana CIA û Tirkîyeyê de karê kontrayî girtiye ser piştî xwe.

Di van rojan de azîneyên (metod) Turnerkirina Serhildanan (Counterinsurgency) a şerê psîkolojîk xwe diyar dike. PDK ango Partî Demokratî Kurdistan bi serokê xwe Berzanî, dixwaze delametên ku CIA, NATO û Daîra Şerê Taybetî li Tirkîyeyê dane wê bi cih bîne. PDK li başûrê Kurdistanê û hemû Kurdistanê hêdî hêdî dibe rêxistineke kontrayî û li dijî têkoşîna Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê bi hevkarîya artêşa tirk û li dûv planên Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA) kar dike.

Şerê Tunekirina serhildanan metodeke ku di sala 1963'an de ji aliyê CIA ve hatiye nûhkirin û niha rista xwe li 40 dewletên cihanê yê 3'yemîn dileyîze. Êdî li Kurdistana

nê hîc derfet nîn e ku bi şerê leşkerî împeryalizm serfiraz bibe. Di vê demê de Counterinsurgency (tunekirina serhildanan) dikeve rojevê û dixwaze rista xwe bîne cih. Mirovên zanyar û ranyar baş dizanin ku li Kurdistanê kontrola împeryalizmê winda bûye û daxwazên Amerîkayê ji bo avakirina pergaleke nû li ser rûyê cihanê bi aliyên valabûnê ve diçe.

Counterinsurgency (tunekirina serhildanan) dixwaze du armancan bi hev re pêk bîne: Yek guhertina civaka kurd li gorî daxwaz û berjewendiyên împeryalizmê, dudu ji hev cûdakirina gelê kurd û PKK'ê. Ji bo guhertina civaka kurd, Berzanî di bin sîwana CIA û Tirkîyeyê de karê kontrayî; wekî kontrayên li Nikaraguayê, UNITA'ya Angolayê, li Afrîka-başûr eşîra Zulu û hwd. girtiye ser piştî xwe û li dijî armancên gelê kurd ên bingehîn derdikeve. Lewra PDK li dijî gerilayên PKK'ê di salên 1992'an de eniya şer vekirin.

Xaleke herî pêwîst ji ev e ku dawîya şerê Xalîcê yê duyemîn gelê tixûbê nerast di nav başûr û bakurê Kurdistanê de hate rakirin; şerê 1992'an çavê gelê kurd li dijî PDK'ê vekir û şerê PDK û YNK'ê yê heta îro û civîna Dublinê rûyê PDK'ê bi şeweyekî eşke-

rê rûreş kir. Revîna zavayên Sedam Huseyin ji Iraqê, civîna Dublinê di nav CIA, MIT, KDP û YNK'ê de amedekirineke nû bû li dijî şoreşa Kurdistanê. Ew dixwazî başûrê welêt bikin wargehê kontrayan, ango artêşeke kurdî ya kontrayan li dijî şoreşa bakurê Kurdistanê û rêveberiya wê PKK'ê, çêbikin û gelê kurd ji azadiyê û rizgariyê dûr bixin.

Counterinsurgency (tunekirina serhildanan) dixwaze ku hêrêmên gerîla biçûk bike, da ku nêzikî di nav PKK'ê û gelê kurdê Başûr de çênebe û şoreş li vê derê cihê xwe negire. Herwiha ji CIA dixwaze bi kontra kurdî re vê derê bike navend ji bo amedekirina livbaziyan xwe li dijî şerê serxwebûnê.

Alîkariya aborî ya ku dewletên împeryalist didin ne ji bo alîkariya gel bi xwe ye. Dirav û materiyan ku didin PDK û YNK'ê pê gel kontrol dikin. Maf û zagonên dadgehî nîn in, PDK li ser hemû hêz û rêxistinên welatparêzî terorê dimeşîne. Kî wekî kontratiyê neke wê birçî bimîne. Alîkariya aborî ji sedî 70 dikeve destê Berzanî û Talabanî û yê mayî jî di nav eşîran de tê parvekirin.

Îro tê diyarkirin ku Amerîkayê bi destê CIA'ê navendek (merkez) li Kurdistanê ava



PDK wezîfeya ku li Angolayê UNITA, li Afrîkaya Başûr Zuluyan û li Nikaraguayê kontrayan pêk anî, hildide ser milê xwe.

kiriye û ji vê navendê fermanan dide kontraya kurdî û artêşa tirk, ka wê bi çi awayî li dijî PKK'ê û gelê kurd şer bikin. Li Başûr civic action bi radeyeke bilind dimeşe. Civic action metodeke Amerîka ye ku bi zanyarên xwe hinek projeyên pêwîst ava dike, da ku kontra û mirovên wan karibin bijîn. Herwiha jî bê guman di nava kontra kurdî de leşkerên Amerîkayê hene û hîneriyên leşkerî û konevanî didin wan. Îro bê alîkariya mirovên sîxûr û kontraya kurdî, Counterinsurgency û leşkerên împeryalizmê nikarin rojekê li Kurdistatê bijîn.

Li vir ne girîng e ku mirov li ser xalên din ên

şerê psîkolojî wekî; Hizbikontra, artêş, MIT, Sîxur, Cahîş, Ragihandin, komên taybetî, komên reformîst.. bisekine.

Kontra kurdî bi xwe di rojnameyan de dibêje ku li dijî teroristan şer dike, ew bi xwe jî rêxistîneke kurd e û ji bo mafê xwe bi serbilindî li ber xwe dide. Lê pratîka wê, gotinên wê pûç dike. Jixwe tu caran berjewendiyên kontra û gel nebûne yek. Kontra kurdî (Kurdistan cephe) jî bi tenê ji bo mafê şexsî û daxwazên împeryalizmê kar dike.

Çawa ku di sala 1981'an de artêşa diktatorê Samoza li Nikaragua ji aliyê Serokê Amerîka Reagan ve hat nûh-

kirin û bû kontra, da ku li dijî komara Nikaraguayê derkeve û şoreşa Sandînîstan rawestîne, wiha jî Berzanî û PDK îro bûye kontra kurdî li dijî şoreşa Kurdistanê derdikeve.

Kontra kurdî û împeryalizm dixwazî wekî li Afrîka Başûr bi "snaky repression" (zordariya koremaran) gelê kurd bixapîne û berxwedana gelê kurd ji dilê wan derxe.

Lê tevî wan metodên jorîn jî her dem gelên bindest serfiraz bûne û bi ser ketine. Ev ne birakujî ye, şerê hêzên kontraya kurdî û hêzên şoreşa Kurdistanê ye.

Î.K/Brüksel

Mirov nikare bibêje ku Mheta kengî ev sendroma Vietnamê di nav gel û serokatiya Amerîkayê de cihê xwe bigire. Lê li gorî dewletên dinyayê, herdem Amerîkayê berî her kesî metodên leşkerî dixê pêşîya metodên siyasî, şerê veşartî an jî şerekî bi di radeyeke nizim de hê ji dema Eisenhower ve dest pê kiriye. Her şer bi şerekî giran û atomîk wekî Nagazakî an jî Hîroşîmayê nebe. Lewre jî divê li gorî Pentagonê şerê veşartî bi dereceyeke nizim ew bigihîjin armancên xwe. Li Îranê di sala 1953'an de û li Guatemalayê di sala 1954'an de dewlet bi alîkariya CIA'yê hatin hilweşandin û dostên Amerîkayê bûn serokên wan dewletan. (Binêre: Richard

Amerîka ji xwe re raqîbên nû naxwaze

Immerman, The CIA ni Guatemala, 1982). Derbeyên leşkerî li Tirkîyeyê bi zanebûn û bi alîkariya Amerîkayê her dem çêbûne. Serokê Amerîkayê Kennedy, serhildanên gelên bindest li cihanê, li dijî bperjewendiyên Amerîkayê didît û di meha rêbendana 1962'an de digot: "Serhildanên li cihanê divê wekî şerê li dijî me werin diyarkirin...Lewre jî stratejiya "Limited War" firehtir bû û metoda "counterinsurgency" li ser zêde kirin. Ev her du stratejî cara yekemîn li Vietnamê hatin ceribandin. Ji ber gelek sedeman ev her du stratejî li Vietnamê bi ser neketin (Binêre: İlhan

Kizilhan, Psychologeistche Kriegsführung (şerê pshikolojî) Bochum, 1992.) Îro ev her du metod û yê din li Kurdistanê bi hêzeke mezin tîne meşandin û gelê kurd bi stratejiyên Pentagon her roj tîne kuştin. Lê ev ne cara yekemîn e ku Amerîka bi metodên xwe gelê kurd û daxwazên wan tune kirine. Her wiha têkoşîna Berzanî jî di sala 1975'an de bi medodê "limited war" hatin meşandin û Berzanî jî peyaki vê leyîstikê bû. Dema jî Amerîka re hewce nekir Berzanî bi hêsanî qurban kirin. Serokê Amerîka Nixon piştî Peymana Cezayir di 5'ê adarê 1975'an de Berzanî agahdarkir ku hemû

alîkariya xwe ji bo kurdan qut dikin. Çiqas Berzanî li Washington dixwaze bi wezîrê dervayî Henry Kissinger re deng bike, Henry Kissinger ev nepejirand. Tê zanîn ku di vê demê de bi hezaran gelê kurd ji aliyê Iran û Iraqê ve hatin kuştin. Bi gelemperî li ser ranyariya Amerîkayê ev tişt dikare were gotin: Armanca herî mezin ya Amerîkayê ev e ku hêzeke dinê wekî Sovyeta berê li dijî wan dernekeve, an jî berjewendiyên Amerîkayê zirarê nebînin. Ev Stratejiya Parastina Hêremî li dijî hemû hêzên ku Amerîkayê dijmin dibîne bi kar tê anîn û

naxwaze ku di herêmek wekî Rojhilata Navîn de yek welatek ji hemû welatên din bi xurtir bibe. Wiha ew dikare rista xwe li hemû welatan bileyîze û berjewendiyên xwe biparêze û bi pêş ve bibe. Ev stratejî li gorî Pentagonê dikare li her herêmen cihanê, bi hinek guhertinên li gorî cih û çanda gelan, were bikaranîn (Binêre: Prevent the Re-Emergence of a New Rival, di The New York Times, 8.3.1992.)

DARA AZADÎ

Nîşe: Di hejmara me yî 44'an di vî quncikî de navê birêz Dara Azadî dernekiye em ji wî û xwendevanên xwe leborîne dixwazin.

FAL



BEARAN (21 Aar - 20 Avrêl)

Hûn ji dostan re dost, ji dijminan re dijminekî/e hêja ne. Lewre divê mirov xwe ji dijminatiya we biparêzin. Lê hin caran wekî Cicero gotiye, kêf çavên aqilê we kor dike, hûn xwe winda dikin, divê haya we ji we hebe.



GA (21 Avrêl - 21 Gulan)

Heta mirov bi we tiştêkî dide pejirandin, îmana mirov diçe. Ew xisletê we mirovan zehf zivêr dike. Bi serhişkiyê kesî tiştêk bi ser nexistiye. Wa ye derfetên ku tên berdestên we dibin qurbana serhişkiyê, her wekî Geothe dibêje: "Fersend revok e."



CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)

Hûn mirovan ji kenan zikûpiştî dikin. Bi vê yekê dilê mirovan geş dikin, lewre jî heval û hogir ji we hez dikin, bes hin caran hûn ji sînor derbas dibin. Heke hûn bi vî awayî bidomînin, wê li ber piyê we mayînek biteqe.



KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Di bin lêvên we yên bişirî de tirs heye, her mirovê baldar dikare vê yekê bi hêsanî bibîne. Lewre divê hûn sedemên tîrsa xwe bibînin û wê tîk bibin. Bacon dibêje "Mirovatî hewce-darê rastiye ye", divê hûn jî vê rastiya xwe bipejirînin.



ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Hûn xwe wekî mamosteyekî baş dibînin, bes zêdetirî wê, hûn dişibin fermanarekî/e mirûz tîrş. Ji bo ku hûn bibin hêvojkarekî/e baş, pêdiviya we bi zimanekî xweş heye. "Ger yek hîni hêza gotinan nebe, hêza mirovan nas nake." (Konfiçyûs)



SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Xuya ye hûn ji şer û pevçûnan hez nakin. Gotina Alacaeus, "Ceng lawê dojhê ye" rê nîşanî we dide, bes çerxa felekê her digere û we dibe dike nava şerên giran. Ji bo vê yekê pêwîst e hûn li kesên derdora xwe binêrin.



MÊZIN (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Tevî hemû jîr û aqilmendiya we, ji ber ku tîkiliya we bi civakê re ne evqas xurt in, mirovekî/e ji rêzê, kare we bi-xapîne, ji bîr nekin, dibistana herî bilind jîyan e. Heke hûn ji vê dibistanê mezûn nebin, jîrekiya we bi kêrî tiştêkî nayê.



DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Her çiqas baweriya we bi we xurt be jî, hin caran hûn dikevin nava xuşûşiyên. Di demên wisa de hûn xwe biparêzin. Rast e, "Aştiyeke nebaş, ji şer xerabtir e." Bes divê ev nebe sedem ku mirov ji aştîyê bireve.



KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Qet kêfa we ji durûtiyan re nayê, dema hûn tiştêkî wisa di mirovan de bibînin, hûn karin bi hêsanî dilê wan bişkînin, lê hin caran hestên mirov jî, buseyan li ber mirov datînin, lewma divê hûn zû biryara xwe nedin.



KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Gelo çi mafê we heye ku hûn ji mirovan evqas daxwazan bikin? Hûn xwe xweşik dibînin, lewre jî hemû kirinên we bi we xweş tînin, ji ber ku Fielding jî gotiye: "Kirinên xweşik xweş in." Bes her kes ne di heman baweriyê de ye.




DEWLİK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Hûn dixwazin "Wekî darekê bi serê xwe û azad, wekî daristanekê bi biratî bijîn" (Nazîm Hikmet). Lê hûn rewşa welatê xwe qet nayînin ber çavên xwe û bi dû jiyaneke qaşo azad dikevin, heke wisa here, hûnê winda bibin.



MASI (20 Reşemî - 20 Aar)

Her kes dizane ku hûn hez ji pereyan nakin, hin kes dixwazin pereyên we ji we bistînin, divê hûn rê nedin kesên wisa, hemû hebûna xwe bixin xizmeta doza xwe. Jiyan hunereke bizahmet e, lewre jî mesele bi destbelaviyê çareser nabe.



Gundî û hêka hespê

Rojekê ji rojan, gundi-
Ryek diçe bajêr, piştî ku qewitî û lazimiyên xwe bi cih tîne, hinekî li nav sûkê digere. Di vê gerîna xwe de li ber deriyê dikane-kê, kundiran dibîne û ev kundir ji wî re gelekî xerîb tînin. Dikive hundirê dikanê û ji yê firoşkar dipirse...

- Ev çi ne?
 - Hêkên mihînan e.
 - Canî jî di nav wan de hene?
 - Belê, canî jî di nava wan de hene.
 - Yeka wan bi çi ye?
 - Yeka wan bi zêrekî ye.
- Piştî vê bazarê yê gundî radibe bi zêrekî kundirekî dikire. Datîne ser piştê kerê

xwe û bi kêf berê xwe dide gund. Gava ku nêzikiyê li gund dike, ji bîr kir ku riya gund serejêr e, kundir ji ser piştê kerê dikeve û gêrî newalê dibe. Gava ku kundir gêr dibe, çima di ser tûmîkê re derbas nabe û kîvroşkek ji bin tûmîkê ranabe û nareve; ji yê gundî were ku ew canî ye û ji kundir derketiye û direve. Çiqas yê gundî bi dûv dikeve û "Şêş...şêş bêxwediyê, va ye maka te li vir e, were cem maka xwe", dibêje jî, lê kîvroşk qet nasekine.

Gundiyê belengaz bi dilekî şkestî xwe digihîne malê. Pîreka wî jê dipirse:

- Çima wiha bêhna te

teng e?

- Qet bi pey mekeve. Îro min li bajêr hêkeke mihîne kiribû. Min ew li ser kerê şidand û gava ku di riya gund de em serejêr bûn, kundir ji ser piştê kerê gindirî, şikest û canî ji nav derket û rewiya. Ez çiqas bi pey ketim û min gazî kirê jî, ew qet nesekinî jina wî jî lê vegeand:
- Wax mala minê, te dît! Ger ew canî nereviyabûna, minê zarokên me lê siwar kiribûna.
- Na keçê na; tuyê çawa zarokan lê siwar bikî, wê piştê wê bişkê!

**BERHEVKAR
MAMOSTE EMÎN**

Şah İsmail

Li gundê Fêra ku bi ser navçeya Farqînê ve ye, LDêhnek (kawikek) bi navê 'Şah İsmail' hebûye. Şah İsmail rojekê bi serê xwe diçe bajarê Amedê û li wir tûşî çar berikbirên Amedî dibe. Ev her çar berikbir Şah İsmail dibin qehweyekê wî didin rûniştandin. Coca-cola û cixareyê didinê û jê re dibêjin: Tu dê niha bi henekî bimirî, emê jî te bibin mizgeftê bişon û tîxin darbestê û bi henekî

emê te binax bikin. Li wê derê, ji xelkên ku beşdarî cenazeyê te bûne emê qala xizaniya te û sêwiyên te bikin da ji bo sêwiyên te diravan bidin. Piştî ku xelk herin, emê jî bînin te ji goristanê derbixin û diravên ku me kom kirine emê li ser hev belav bikin.

Şah İsmail jî, vê yekê dipêjirîne û li dûv gotina berikbiran hemû tişt pêk tînin. Piştî komkirina diravan ji xelkê yê berikbir yek bi

yek ji bin darbestê derdikevin û ji holê winda dibin. Demekê şûn da xelk darbesta Şah İsmail tînin goristanê. Mele ji xelkê dipirse: Xwediyê mirî kî ye, gora wî li ku hatiye kolandin?

Li ser vê gotina yê mele, Şah İsmail ji nav darbestê wek şeytanqûnî bûbe, deng didê û dibêje: Xwediyê mirî kor e. Ji bo Xwedê, bi xêra min bibin 'yildizgarajî' ya Farqînê.

DILAWER

Nexweşiya mîhê

Li gundekî Amedê mîheke gundiyeke nexweş dikeve. Yê gundî, çî dermanê ku dizane tîne û gîşa dide mîhê lê, çareyekê ji nexweşiya mîha xwe re nabîne. Ji naçarî radibe mîha xwe ser jê dike û hûr û rêviyên wê jî dixê tûrikekî û

berê xwe dide nexweşxana Amedê. Li nexweşxaneyê dikeve dorê û dema ku dora wî tîne dikeve mezela pişîjk. Piştî ku dikeve hundir pişîjk jê dipirse...

- Ku derê te diêşe?
- Tu êşa min nîn e.
- Baş e tu hatiyî çî?

Li ser vê pîrî pişîjk, yê gundî devê tûrikekê xwe vedike û li ser maseya yê pişîjk vala dike û dibêje: Pişîjk beg, mîha min nexweş bû, min hinavê wê ji we re anî da hûn çareyekê jê re bibînin.

BEDRÎME OLCAY

Girîngî siyasî û mêjuy Şerefname bo xebatî istay gelî kurd (1)

Nizîkey çuwar sed sal le mewber Şerefname nusrawetewê em şakarey Bedlîsî xalêkî pîrşingadare û geş e le mêjuy gelî kurd û hiç berhemêkî tir niye ke biwanê şan le şanî bidat û be hawtay danîrê. Cêgay xoyetî ger runakbiranî gelî kurd her le istawe ta salî 1997 yadî Şerefname be kar û lêkolînewe û aheng bikenewe penû wane lem serçawê dî mêjuyîye wer bigrin.

Şerefxanî Bedlîsî le mangî gelawêjî 1597, le bergî yekemî Şerefname botewe û salî doway bergî duwemîşî. Tewan û kird êdî her lew rojewe ta em ro em şakare girîngî xoy le dest nedawe û roj be roj birewî xoy berew pêş deçê û ziyatir be nîrx debê. Jîmarey destnusekan ke le mozexane û pertukxaney Rusya û Berîtanya û Nems û Turky û Iran parêzrawin nişaney grîngî em pertukene. Ke her le sedey 19 we gerîdey rojhilatnasekan nîrxî em pertukeyan helsen-gandewe û weryangêrawete ser zimanekani xoyan û bayexêkî taybetiyan pê dawê bo lêkolînewey mêjuy konî kurd welatanî rojhelatî nawerast.

Lem nusrawey Şerefxan da xoy zaniyetî ke mêjuy gelekey ta ew serdemey xoy hiç nusrawêkî wa be nîrx nebû nusrabêtewe. Le ber ewe hewlî da ke şakarêrêkî baş binûsetewe le ser gelêkiy

Şerefxan nek تنها mîr û fermarewa bû bêt belku mirovêkî birwurd û berçavrun û runakbîr buwe. Asoy frawanî birî şûrî destelatî mirayetî bezandewe. Ew peywendî nadiyarî rudawekani pêkewe bîniwe. Le fermanîdar û helsen-gandan da babetî durbin buwe û cilewî soz û endêşey berda nekirduwe. Le katêk da şerî ayînî û mezhebî lew perî girgirtin da bu belav Şerefxan destberdavi giyanî babetî nebuwe her çend lew zemanê da bawî ewe bu le nusîn da bîr û bawerî yektrî tîr cwên bikrê.

Belam em hewlî dawê xoy berz bigrê, eger çî pertukekey xelatî Sultanî



Osmanî wergituwe. Be ew perî rêzewe newî Şay sefewiyekani kirdu we ke her du la xuyên xori yektirbun şayanî base, Şerefxan zor be zeqî pêy le ser şunaşnamey xoy dagirtuwe û hest dekrê ke rixney le kirdewekani osmaniyekan girtuwe û çaupoşî lê tavanekan yan nekirduwe.

Mêjunusekanî pêş Şerefxan wek (İbn ul Erzeq el Fariqî û Memunbeg) tenya mêjuy nawçeyek yan mênîşînêkyan le ber caw girtuwe nek seranserî xakî Kurdistan. Em newî yek be yekî mîrnişîn û dewlete kurdîyekani hênawe û kesî piştgiwê nexistu we le ser bine may ayînî yau helwestî siyasî. Em mêjuy Bedlîsî nexistuwete pêşî pertukekey belku le dawîya pertukî basî mîrnişînekey xoy kirdu we. Lêreş da le gel xoy û mê-

ju rastgo buwe û zor şiftî baş u xirapî le binemaley xoy nusiwe. Ke renga siyasiyekî rojhalatî em ro newêrê be raşikawî ew rastiyane bixate ru...

Şerefxan mêjuy hemû dewlet û mîrnişînekani kurdî tomar kirdu we le pertukekey peywendî nêwanyanî dozîwetewe û wurdekariyekî gewrey nuwanduwe sebarew ew pîrsyarey kê kurde û le ser kurd dejmêdrê ew be runî derî xistuwe ke kurd çuwar beşe û lu û goranî be du beş lew çuwar beşe danawe. Diyar e dewletî sefewîş emaney be kurd danawe.

Şerefxan piley mîrîmîranî pêbexşîra û deselatdarani sefewî lur û goraniyan be kurd danawe û wistuyane şeweyek le berêwberayetiyekey yekgirtu bo hemû Kurdistan damezrênin. Lêred amaje dekat bo ewey ke lur u

goran kurde u le heman kat da le du toy Şerefxanmeda derdekewe ke lur û goran yek helwestî siyasiyan hebuwe le gel kurdekanî tir.

Ew wêneyey gelî kurd ke le ser laperekanî Şerefname da pêşandra we cêgay xoy le dilî mezin û miranî kurd û runakbirekan kirduwe û zorbeyan daneyekî pertukekeyan zor be nîrx parastuwe û şanaziyan pêwe kirduwe. Her weke zor kes girîngî dedate em pertuke bo dozînewey nasnamey netewey kurd u zindû kirdnewey samanî neteweyî, he boye Emin Zekî Begîş bo projey nusînî mêjuy gelî kurd her yekser penay birdote ber em pertuke.

Kokirdinewe û nusînî
FADIL AHMED
Wergêr bo zarawey soranî:
DİLÊR
Domahîk heyê

Yên berî me çî,
çawa dinivîsandin?

Ji dîroka rojnamegeriya kurdî

Nivîsek ji hejmara 29. a
Kovara Hawar
Mêjû: 1941, 10'ê pûşperê

Dilgirsî û Dilovanî

Mirovêkî xwe û zarowên xwe bi xebata mdestê xwe bi xwedî dikirin. Qencbûna sihet û xurtbûna milên wî, tim jê re kar û xebat pêk tanîn. Bê zehmetekî pîr, di riya xebatê de jîna xwe diqedand. Lê wextekî hat ko belengaziyeke mezin kete nav welêt. Êdî xwedî peran nema ew li cem xwe dixebitandin. Çima ko, tu kar ji wan re di wê xebatê de ne diman. Destengî ewqas pêş de çû ko dewlemend ji birçî mayinê difîrsîn.

Mirovê han jî wek xelkê belbî hin pirtir barê dijjwariya vê tengasiya han hiltanîn. Ew çend qirûşên ko di firehyê de bi xwîdana eniya xwe civandî jî xwarin. Dû re tiştên nava malê jî di wê rê de çûn. Lê dawîya wan rojên teng ne dihat. Gava xwe û birçîbûn li ber hev dîtin, nexweşiyê jî lingê xwe avêti bû hundirê malê û xelkê malê li pê hev xisti bûn nav nivînê. Heya wê demê destên xwe li pêş kesî xweher kirin ne hati bû bira wî. Vi halê han ew ajotî bû ber derê cîranan.

Di rex mala wî de yek ji ê din dewlemendtir du cîran hebûn. Rabû çû nik yekî wan û halê xwe jê re got. Dewlemendê pêşîn mirovêkî dilhişk bû. Agahiya wî ya ser halê cîranê belengaz tu deriyên qencî û comerdîyê ji dilê wî venekirin. Bi gotinên xweş mirovê belengaz ji rûyê xwe da alî.

Ji ber ko wî mirovê zîvar di emrê xwe de destê xwe ji ber kesî xwar re kiri bû, rûhişkiya, dewlemendê pêşîn yekcar ew ji comerdîya camêran bê hêvî kiri bû. Çavên jinik û zarokan li vegera wî a mal bûn; nizanî bû ko çawan destvala vegere mal. Dilê wî ê girs ne dixwest êdî here ber derê tu kesên din.

Bi dilêşî berê xwe da mal û vegeerî. Dema di ber mala dewlemendê din re borî bê ko ew bibîne, mirovêkî wêkî li pê wî çû bû. Gava mirovê zîvar bi dilê şikestî keti bû xanî û nav koma zar û zêrçên xwe ên birçî û nexweş; mirovê ko li pê wî hati jî li ber derî rawestî bû. Ew mirov cîranê wî, dewlemendê din bû.

Jin û zarokan bi diltengî li çavên wî dinêrin, dixwestin tê de şopa comerdîya cîranan bibînin. Lê sed mixabin ko ji çend hêstiran pêve tiştêk ji çawan ne dixuyan. Jina wî destvala bûna mîrê xwe bîr biri bû; lê dîsa xwe ji pîrsinê ranegirt:

— Gelo, te ji cîranan tiştêk çar ne kir? Mêrik bi dilekî şewitî lê vegeerand û got:

— Na. Ez çûme cem yekî, rûyê xwe ji min bada. Ê din jî; ez neçûm balê. Dewlemend ji hezkirina peran pê ve çî dizanin? Wan mirovatî, camêrî, dilovanî hemû ji bîr kirine.

Di wê gavê de bû ko derî vebû û yek kete hundir û got: "Cîranê delal! bê ko tu riya xwe bi min xîni, te ez jî bi agirê dewlemendê din şewitandim. Dewlemend hemî ne malperest in. Hin hene ko wek we, ji comerdîyê hez dikin. Ji îro bi şûn de tu jî wek birayekî min di nav mala min de xweyî par î."

Bi destê belengaz girt û bir. Ji wê şevê bi şûn de heyra ew destengî di welêt de rabû mîrikê zîvar teva zarowên xwe di mala cîranê dewlemend de ma û tu tengî ne dît.

FIAD CEMİL PAŞA

Koma Çiya ku bi kaseta xwe ya duyemîn (Dilana Bêsînor) silav li muzîkhezan kir, xwe wiha bi nav dike:

EM ŞAGIRTÊN HUNERÊ NE



KOMA ÇIYA

Heta ku qedexeya li ser zimanê kurdî ranebûbû (li Bakur), kaset bi awayekî "neqanûnî" derdiketin û li malan pirtir bi dizî dihatin guhdarîkirin. Piştî derbeya leşkerî (12'ê rezbera 1980'yî) bi tenê komek hebû ku kasetên wan li ser destan digeriyan, Koma Berxwedan. Kom û kesên ku pişt re rabûn, tevan stranên vê komê gotin, heta bêyî ku diyar bikin, stranên wan wekî yên xwe di kasetên xwe de bi kar anîn û strîn.

Di rewşeke wiha de komek derkete meydana muzîka kurdî. Sal 1991, werze bihar û meh jî avrêl (nîsan) bû. Pêlên şoreşê ew li hev civandin, li Aksaraya Stenbolê. Pêşî li Komeleya Nermikan a Meletiyê, piştî ku Navenda Çandî ya Mezopotamyayê (NÇM) ava bû, kom berê xwe da vê saziyê. Beriya ku Koma Çiya here vê saziyê, bi Koma Serhildan re (ku ji du kesan pêkhatibû) dibe yek. Dîsa di bin navê Koma Çiya de.

Vê demê di NÇM'ê de Koma Mezrobotan, Koma Azad hene, lê Koma Azad ne li Stenbolê bi cih û war e. Bi tevî van koman dest bi çalakiyên xwe yên muzîkê dikin. Li dîlan, şahî, miþing û şevbihêrkan bi gel re di govendê de ne, bi tevî stran û awazên xwe ve.

Koma Çiya di gelawêja (tebaxa) 1992'yan de gula xwe ya gupik a pêşîn pêşkêşî gel dike, bi navê "Rozerîn"

Endamên komê dadixuyîn ku gel ev kaset zehf ecibandîye û pir jî hatiye firotin, di gel kasetên ku bi awayên korsan û neqanûnî derketine.

Ev kom, ta niha du can jî dane tevgera azadiyê; yek ji Başûrê Biçûk û yek jî ji Bakur. Bi rewşa xwe re jî sînoren li serkevçika dilê vî welatî bînpê kirine. Endamên wê her sabît nebûne. Kêm û zêde bûne. Niha jî çar kes in.

Di destpêkê de, ev kes bi tenê distriyan, lê îro ji gîtarê heta bi piyanoyê amurên (hacetên) muzîkê jî bi kar tînin. Koma Çiya piştî bi sê salan dîsa di meha gelawêja 1995'an de bi navê "Dilana Bêsînor" careke din pate dan muzîkhezan, bi derengî be jî. Sedemên vê yekê jî bi rewşa saziya xwe ve girê didin û eşkere dikin ku hem kom pir in û kasetên wan bi dorê derdikevin; hem jî rewşa aborî destûr nade wan ku zû kaset çêbikin. Her wiha naxwazin berhemên xwe bidine bazirganên vî karî jî.

Hewce ye em bibêjin ku Koma Çiya li gelek deveran jî konser dane. Ji başûrê welêt (Hewlêr, Silêmaniyê, Şeqlawa, Rewandîz, Amediye û Helebçe...) heta bi Kafkasan, ji Balkanan heta bi dewletên Ewrûpayê, ji Îskenderûnê heta bi hin bajarên bakurê welêt.

Koma Çiya piştî kaseta xwe ya bi navê "Rozerîn" îcar bi "Dilana Bêsînor" derkete pêşberî gel. Li ser xebata wan a dawîn, rewşa muzîka kurdî, me li navenda rojnameyê bi wan re sohbetek kir. Em nêrîn û ramanên wan pêşkêşî dêhna we muzîkhezan dikin.

Pêşî ez dixwazim bi navê kaseta we ya dawîn dest bi sohbetê bikim. Straneke we ya bi navê "Dilana Bêsînor" di vê xebata we de nîn e, lê we ev nav lê daniye. Ji aliyê din ve, ev nav gelek tişt tîne bira mirov. Lê belê, ez dîsa jî dixwazim hûn sedema vê yekê ji me re eşkere bikin.

- Hûn jî zanin, xebata me ya pêşîn bi navê straneke me ya di kasetê de derket, Rozerîn. Lê îcar em fikirîn ku ne bi navê satranekê, lê belê bi navê giştî ku karibe têkoşîna gelê me îfade bike derkeve. Lewma jî me navê "Dilana Bêsînor" munasîb dît.

Ji hêla din ve, di çanda me ya nû de, dîlan tê maneya şer jî, şerê azadiyê jî, bi rastî ne bisînor e. Beriya vê yekê heye. Ji serê dîrokê tê û berdevam e. Niha di kesîtiya gelê me de ev rewş diqewime.

wime.

Li ser gotinên "muzîka kurdî, muzîka kurdî ya hemdem, ya nûjen" gelek tişt tîne gotin û nivîsîn. Bêhtir li bakurê welêt, ev yek wisan e. Hîna tişteki zelal nîn e û tişteki rûniştî jî nîn e. Di gel vê rewşê hûn xebatên xwe bi çî nav dikin, di ku de bi cih dikin.?

- Ji bo navlêkirinê, hîna zû ye. Niha em formên otantik bi kar tînin, stranên dilzîziyê û formên marşan bi kar tînin û distrên. Em hinek jî rewşa gel û qonaxa ku gelê me tê re dibihure didine ber çavên xwe.

Hemen hemen hemû kom û kesên ku bi kurdî distrên, di qonaxa azmûnî (tecrûbî) re derbas dibin. Awayek, teşeyeke diyarbûyî, rûniştî jî nîn e. Em jî vê yekê dijîn. Nimûne, hûn li Ciwan Haco jî binêrin, hûnê bibînin ku carinan rap çêdîke, carinan caz çêdîke. Stîleke wî ya diyarbûyî û hevgerî nîn e. Her wiha xebatên Hunerkomê yên dawîn jî didine nîşan ku ew jî di gerîna awa û terzê de ne.

Ku em hêne ser Navenda Çandî ya Mezopotamyayê (NÇM) jî ev yek heye. Li vir jî gelek kom û kes hene eynî tiştî

dijîn. Nimûne, em tev jî di muzîkî de pirdengiyê diceribînin.

Niha em dixwazin li hemû çîn û tebeqeyan ên gelê xwe deng bikin. Em xwediyê vê baweriyê ne ku, divê hunermand pêşengiyê ji gel re bike û li pêşiya wî bimeşe.

Dema mirov "Rozerîn" û "Dilana Bêsînor" dide ber hev, digihîje ramanekê. Ramana ku çî dema yek li qaseta we ya berê guhdarî kiribe û pişt re jî li ya dawîn guhdarî bike, bêyî ku bizanibe ev kaset Koma Çiya ye, wê tafîl "Rozerîn" were hişê wî. Ji aliyê amurên muzîkî û hin formên otantik ên kurdî ve ev rewş heye. Bi van yekan re gelo ez dikarim bibêjim we ji xwe re awayek pejirandîye, an jî hûn gihîştîbin encamekê?

- Rast e, em gihiyane encamekê, me hin tişt ji xwe re diyar kirine. Em zêdetir li ser formên otantik ên muzîka kurdî disekinin. Li ser wan forman stranên çêdikin. Rîtmên jî her wisa ji xwe re dineqînin. Lê divê bê gotin ku, em dixwazin wan bi awayekî nû bînine zimên. Ji bo me rîtm, maqam zehf girîng in.

Gava em li ser vê kasetê jî bisekinin, guhdar

dizanin ku wê Koma Çiya çî bibêji. Ev nîşan hene. Bêrîtan, Zeriyên Dilsoz, Bes e; ev form wê ji bo xebatên me yên nû nîşan bin û ev awa wê êdî rengên me bi guhdarên muzîkê bide diyarkirin. Pir-hindik ev rewş heye.

Jixwe komên li NÇM'ê wekî hev dixebitin. Ev jî me teng dike. Em jî dixwazin zûtir cudatiya me xuya bibe ji yên din.

Di vê xebatê de, me li gorî ya berê amurên din jî bi kar anîn. Wekî kemenceya klasîk, ribab (kabak kemane), gîtar. bas gîtar Mesela, me zurne bi kar neanî. Bingeha "Rozerîn"ê ne xurt bû. Hêjayî gotinê ye ku em bibêjin, di muzîka me de zurne bi awayekî hov tê bikaranîn. Hema dixwazin di her tiştî de wê lê bixin. Wekî ku bêyî wê tiştê nabe. Divê mirov li tiştên din jî bigere û bide nîşan ku bêyî wê jî dibe.

Li ser rîtmên dixwazim rawestim. Gava mirov li xebatên heyî guhdarî dike, bi giştî rastî rîtmên 2/2, 4/4, 6/8 û hwd tê. Mîna ku qet rîtmên din nebin. Her rîtmên sivik tîne tercîhkirin. Lê yên giran na. Di xebatên we de, ji derve-



Koma Çiya di şadûmaniyêke HADEP'ê de dixuye.



Der barê kaseta xwe ya berê û niha de wiha dibêjin:
"Em di kaseta berê de li ser rîtmên distrîn, lê di ya nû de bingehêke xurt heye."

yî van rîtmên, rîtmên din jî ji mirov re dibêjin...

- Belê, em jî dixwazin ku rîtmên zehf nehatine xebitandin bi kar bin. Jixwe em li ser vê yekê jî disekinin. Em li rîtm û formên zengîn digerin, di muzîka xwe ya gelêrî de. Em çend nimûnayan bidin. Rîtmên 12/8, 9/8, 5/4, 3/4 û hwd. kêma hatine bikaranîn. Gelek kes û kom, stranên li ser çar notayan dibêjin. Rîtmên hêsan (basît) dixebitînin. Me dil heye ku em usûlên tevlihev û giran, rîtmên leng û kulek bi kar bin, di xebat û berhemên xwe yên nû de. Me ev yek daye ber xwe.

Li ser maqamên kurdî jî gengeşî têne kirin. Ji navên hinan diyar dibê ku ew meqamên kurdan e. Nola dugah, sêgah, rast, kurdîlî hîcaz û hwd. Gelo li ser van jî xebatên we çêbûne, di kasetên xwe de we kîjan bi kar anîne?

- Li ser maqamên kurdî xebatên ilmî tên kirin. Li başûrê welêt û rojhilat, di vî warî de hin gavên berbiçav hatine avêtin. Lê jî ber ku xebatên wan bi herfên erebî ne, em nikarin ji wan is-

tifade bikin.

Li Ewrûpayê jî di vî warî de xebatên Mamos-te Îqbal hene. Ew jî bi zimanê biyanî ne. Hin maqam mîna dugah, sêgah, çargah, rast, hîcaz, kurdîlî hîcaz bi awayekî zanistî hatine selmandin ku yê kurdan in. Wekî din jî hene, divê xebat li ser wan jî bêne kirin.

Di kaseta xwe (Dilana Bêsînor) de hin maqamên ku me ew bi kar anîne ev in: Hîcaz ûşaq, çargah û her wekî din

Di lîteratûra muzîka me de gotinên "dengbêj" û "stranbêj" hene. Hûn xwe nêzikî kîjanê dibînin?

- Em dixwazin wekî dengbêjan li ser rewşa gelê xwe berhem biafirînin. Vê qonaxa ku gelê me tê de dijî em dixwazin bînine ziman. Em naxwazin bi tenê stranbêjiyê bikin. Her wisa em dixwazin di vî warî de xwe bihêvojin (perwerde bikin).

Di vê domanê de em dikarin navê şagirtên hunerê li xwe bikin. Hunermendî gelek zor e. Em pêwistî bi ilmê muzîkê dibînin. Niha em di çine qursên muzîkê. Em der barê muzîka ewrûpi-

yan de dibin xwedî agah. Li gorî van hînbûnan jî, em lê dixebitin ku di muzîka xwe de tiştin nû biciribînin.

Me di serî de jî gotibû, jî ber ku der barê muzîka kurdî de (li bakur) ne sazîyek, ne dibistaneke taybet heye ku em herinê û tiştinan hîn bibin. Armanca me ew e ku em bibine muzîsyên. Divê ku jî her hêlî ve em berhemên xwe çêkin. Armonî, gotin, rîtm, bingeh, aranjeya kasetê, em bi xwe diyar bikin û çêkin.

Ev e çar sal e ku hûn bi muzîkê re êdî bi aweyekî tam ne profesyonel be jî, eleqedar in. Li gorî destpêkê, ma pêşveçûnek çenebûye? Hûn hin mafê gotina "Em hîna di despêkê de ne" di xwe de dibînin?

- Berê me baş muzîkas nedikir. Niha pêşveçûneke berbiçav di koma me de heye. Lê hîna jî em xwe dihêvojin. Di mercên (şertên) asayî de mirov hêvotina (telîma) xwe temam dike û pişt re dest diavêje karê ku mirov dixaze bike. Lê rewşa me tersî vê yekê ye. Beriya ku em xwe bihêvojin me dest bi xeba-

ta muzîkê kir.

Di serî de me Koma Berxwedan, komên tirkan guhdarî dikirin. Me muzîk nizanibû. Berê du sazên me hebûn hew. A niha em ûd, gîtar, saz, cûra, piyano, fûmba, bendîr, def û hwd. bi kar tin.

Wê gavê di nav me de hevalê Melek (A.Melik Şêxbekir) piçek baş bû, cerbînen wî hebûn. Di warê piredengiyê de hevalên din ên NÇM'ê alî me dikirin. Lê niha em aranjeyên kaseta xwe çêdikin. Di vê kaseta me de dengê d u y e m î n , dengê sêyemîn, muzîkên navber, trafîka wan jî aliyên me ve hatine çêkirin. Êdî em bi serê xwe partîsyonên wan çêdikin.

Di kaseta pêşîn de bêtir keda me di strandîna per-

çeyan de hebû, di ya nû de hemen hemen her tişt jî aliyê me ve hatiye çêkirin.

Bi hilanîna qedexeya li ser zimanê kurdî di sala 1991'ê de, her kesê ku dengên wan piçek

"xweş" bû, êrişî Unkapaniyê piyaseya muzîkê kirin. Wê gavê bazirgan, li gorî dilên xwe kaset çêdikirin. Heta kasetên pop ên kurdî jî çêkirin, tevî yê arabesk. Lê vê gavê ev geremol nîn e. Hin jê serîdin û çûn.

Hûn kom û kesên çî li Bakur û çî jî li Ewrûpayê, karin ji me re binixînin?

- Emê bi tenê li ser xebatên ku em wan diecibînin besekinin. Keda Hunerkomê, Koma Berxwedan tê zanîn û kirinên wan eş-

kere li holê ne. Divê em bi taybetî Sefkan bi bîr bin.

Xebatên Şivan Perwer, Nizamettin Ariç, Ciwan Heco, Koma Dengê Azadî em hêjayî nixandîne dibînin.

Belkî li Bakur cara pêşîn Şivan bi "Ferzê" dest bi piredengiyê kir. Nizamettin Ariç, gîtar bi kar anî di muzîka kurdî de. Em xebata Koma Dengê Azadî ya pêşîn "Hêvî", di nav xebatên Hunerkomê de jî xebata bi navê "Marşa Azadiyê" zehf balkêş dibînin.

Em komên NÇM'ê tev mîna hev in. Em ne yekê di ser xwe re û ne jî di bin xwe re dibînin. Em zehf dişibin hev.

Ez dixwazim di civaka kurdan de, li ser bendora muzîkê bisekinim. Rojhilatnas di berhemên xwe de jî dixuyînin ku kurd jî strandîne, ji muzîkê hez dikin. Îcar em dema li tevgera azadiyê dinêrin, beriya ku bi peyayên xwe bikeve malan "bi stranên xwe" kete mal^nkurdan. Lewma em dikarin navê "şoreşa bi stranên destpêkirî" jî lê bikin. Hûn çî dibêjin?

- Tesîra muzîkê di nav civaka me de tê zanîn. Di şoreşan de, di hişyarkirina gelê de, fonksiyona wê jî baş tê zanîn. Tiştê ku bi gotinê nayê kirin, dikare bi muzîkê bê kirin.

Em dixwazin ji serboriyên xwe jî nimûneyan bidin. Di şahî û şevbihêkan de jî bi qasî ku gel li muzîkê û li çalakiyên hunerî guhdarî û temaşê dike, guh nade axaftinan. Kurdên Sovyeta berê jî her wisa in. Dema çalakiyêke hunerî bihata pêşkêşkirin, deng ji kesî dernediket.

Wekî gotina dawî tişteki ku hûn bibêjin...

- Me di vê kaseta xwe ya dawî de anketekê per belav kiriye. Daxwaza me ew e ku guhdarên me pirsên me bibersivînin û wan bigihînin me. Lewre bersivên wan, nêrîn û hizrên wan ên der barê xebata me de, ji me re girîng in. Em li benda wan in.

HEVPEYVÎN:
ZANA FARQÎNÎ

Livbaziye gerîla hem li Başûr û hem jî li Bakur dom dikin

Di şerê Çiyayê Gabarê de 17 leşker mirin

Şerê di navbera hêzên PKK'ê û dewleta tirk de berdewam in. Di operasyonên leşkeran de cerdevan jî beşdar dibin. Ji aliyê din ve operasyona ku PKK'ê li Başûr bi navê Operasyona Welatê Rojê bi şeweyeke tund didome. Li gorî saloxiyên ku gihane me, gelê Başûr bi tevî hin partiyên ve piştî didine şervanên ARGK'ê.

Başûr-Zaxo
12.9.1995- Operasyona Welatê Rojê ku ji layê PKK'ê ve berî bi heyamekê dest pê kiribû, bi hemû diwariya xwe ve berdewam e. Li dût pêzanînen ku bi destê me ketine, giraniya şerê li navbera PDK û PKK'ê ketiye devera Zaxoyê. Piştî êrişê hêzên PKK'ê li ser 3 sengerên PDK'ê ku li derdorê Zaxoyê bûn, hate zanîn ev her sê senger jî ketine bin kontrola gerîlayan. Piştî rûxandina her sê sengeran, gerîla bêziyan ji deverê vedikşe.

Di sa her li vê deverê şervanên ARGK'ê êrişêke tund arasteyî du binecihên PDK'ê li ser Pira Îbrahîm Xelîlê dikin. Di gel vê êrişê gerîla, hêzên

Tirkiyeyê bi palpiştiya 8 tankan ve derbasî axa Başûr dibin. Her wisa li devera Berwariyan, li derdorê Kanîmasiyê jî hate zanîn ku, hêzên dewletê derbasî axa Başûr bûne.

Piştî rizgarkirina Bajêrikê Bamernê jî dest hêzên PDK'ê, hate ragihandin ku cemawerê Bamernê di nav xwe de heyek tek pêk anîne û bi serperîştîya vê heyetê, ji bo riswakirina hevkarîya PDK'ê di gel dewleta Tirkiyeyê xwepêşandaneke saz kirine û di vê xwepêşandanê de wêneyê Serokê PKK'ê A.Ocalan rakirine û ew serokê neteweyî pejirandine.

Bakûr, Şirnex Culemerg

12.9.1995- Li derdorê Çiyayê Gabarê, Çiyayê Bizinê û Berfê, hêzên dewletê li dijî hêzên PKK'ê operasyon dest pê kirine. Li dût pêzanînen ku gihîştine me, li devera Çiyayê Gabarê hêzên dewletê tûşî buseyêke gerîla dibin û di berdewamiya vî şerî de 17 leşker mirine. Her wisa di vî şerî de gerîlayek jî birîndar dibe. Der bareyê şerê li Çiyayê Bizinê de çî saloxî bi dest neketin.

Ji layekî din ve li devera Çiyayê Cilo, bi palpiştiyêke mezin ya cerdevanên deverê, hêzên dewletê operasyonêke

berfireh dest pê kirine. Li ser vê beşdariya cerdevanan di operasyonê de, hêzên ARGK'ê li dijî gundên cerdevanan ên li deverê êrişên xwe dest pê kirine. Di encamê van êrişan de hate zanîn ku gelek cerdevanên gundê Dostkê hatine kuştin û birîndarkirin.

Her divê rojê de li devera Etrûşê ku bi ser Culemergê ve ye, di navbera gerîla û leşkeran de şerek rûdide û di encamê vî şerî de hate zanîn ku, di gel subayekî bi navê Ali Şevki Yaşar, leşkerek jî hatiye kuştin.

Dersim Çewlik
12.9.1995

Li navçeya Xozatê hêzêke leşkerî bi ser buseyêke gerîla ve hildibe û di encamê şerê di navbera her du hêzan de, hate zanîn ku gerîlayek û 5 leşker mirine.

Li devera Mutkê jî, di

rûdana şerê li navbera her du hêzan de 6 leşker tene kuştin û 6 jî birîndar dibin.

Dengên dijberî yê hevkarîya PDK û Tirkiyeyê bilind dibin.

Sekreterê Giştî yê Partiya Zahmetkêşên Kurdistanê Qadir Ezîz, der bareyê hevkarîya PDK û Tirkiyeyê de nêrîna partiya xwe anî ziman û got ku, bi vê hevkarîyê, şoreşa Bakurê Kurdistanê hatiye vederkirin. Piştî daxuyakirina ku PDK

berjewendiya xwe ya partiyeyî di ser berjewendiya gelê Kurdistanê re digire, Qadir Ezîz axaftina xwe wisa domand: "Heger li başûrê Kurdistanê xiyanetek peyda bûye, pêdivî ye ku PKK berhingariyê vê xiyanetê bibe."

Di gel daxuyakirina Qadir Ezîz ku hebûna PKK'ê ya li başûrê Kurdistanê nayê rexnekirin, ragihand ku PKK biza-veke welatperwer e û hebûna PKK'ê ya li ba-

şûrê Kurdistanê tiştekî zor siruştî ye. Qadir Ezîz, "Kes nabêje rêxistinên Iraqî li Başûr çî dikin. Her kesekî ku ji bo Kurdistanê xwînê dirêje cihê wî li Başûr heye", got.

Piştî destpêkirina operasyona PKK'ê li Başûr, êrişên hêzên PDK'ê yê li dijberî ezîdiyan, jî layê komel û sazîyên ezîdiyan ve hatin riswakirin...

DEM / Welatê Me



Ev federasyon, an jî ev Hikûmeta Federe ya li başûra Kurdistanê êdî nema dimeşe. Jixwe heta niha jî nedimeşiya. Çima nameşe? Ji ber ku bingeha wê ne dirust e, hevîr û haveynê wê ne dirust e. Baş tê zanîn ku di çî dem û qonaxê de ev meclîs ava bû, tiliya kê û bi rêberîya kê jî ava bû ji her kesî re diyar e.

Di dema Şerê Xelîcê de yek rêber û pêşmerge li Kurdistanê nemabûn. Gel bi xwe şerê xwe kir li dijî Sedam. Di vê demê de hem li Bakur, hem jî li Başûr bes mufrezeyek hizbên Başûr hebû; ew jî li gundê bajarê Çelê li Êrişê bû, lê belê di gel qerekola tirkan bû, alîkariya tirkan dikirin da ku bakuriyan bikin ceşên tirkan.

Federasyona Demokratîk

Em bînin ser dema piştî Şerê Xelîcê, qewetên tehaluf dîtin ku mîletê kurd ber bi serxwebûnê diçe û li vir bes gel û PKK heye. Li rexê din jî şîa bi alîkariya Îranê dixwazin ku Sedam bikeve, ew dewletê bixin destê xwe. Ev tişt jî xwe re gelek xeter û nebaş dîtin. Li ser vî tiştî Sedam nerûxandin, rê dan Sedam ku hem li kurdan, hem jî li şîyan bide. Sedam jî li herdu terefan da û herdu teref jî ji qewet xistin. Piştî Amerîka gote bes e û guhê Sedam kişandin û vegerandin paş xeta 36'an. Gazî PDK û YNK'ê kirin anîn Kurdistanê û Buch jî, xwe kir xwediyê kurdan. Bi vî awayî jî kurdan re pergalek saz kir.

Em dibînin ku ev Hikûmeta Federe ji ber ku li ser esasê berjewendê gelê me nehatibû avakirin, li dijî menfeetên gelê me hatibû avakirin, lewma nemeşiya. Erê hinek karê baş jî bo neyaran pêk anî. Mesela, di 1992'yan de li dijî PKK'ê şerekî mezin li darxistin û heta niha jî her xizmetê jî neyar re dikin. Lê ya ku niha diyar e ev hikûmet an jî parlament şixul nake. Yanî ev herdu hêzên hikûmet pêk anîne, YNK û PDK jî her li hev didin û şer dikin. Bi hezaran însan hatin kuştin û birîndarkirin. Ew bi xwe jî dibêjin ev Parlament nameşe. Hîn 4 roj berê êriş birin ser serokwezîrê xwe

Kosret, xwestin bikujin.

Lewma divê ku ev federasyon rabe û li şûna wê federasyonê rast û dirust bê damezirandin. Divê ku destê dijmin tê de nebe û demokratîk û neteweyî be. Yanî her hêzên neteweyî tê de cih bigire û xwedî gotin û maf be. Niha li ser vê bingehê hêzên li başûrê Kurdistanê dixebitin û ez bewer im ku li ser vî esasî yekîtiya neteweyî baş ava dibe, KDP û YNK jî divê ku li ser vî esasî bifikirin. Destê neyar jî nava xwe derxin. Di federasyonêke wisa demokratîk de YNK, PDK û PKK divê ku rolên xwe yê esasî bibînin. Ev êrişê PKK'ê ya li ser PDK'ê, ne li

dijî yekîtiya neteweyî ye, na xêr, ev êriş li dijî hevalbendiya neyar e, yanî hevaltiya Tirkiyê ye. Heta ku ev hevalbendiya neyar ranebe, her ev yekîtiya neteweyî pêk nayê, me dît pêknehat. Maneya xwe, divê ku ev peywendîya bi tirkan re qut bibe. Ger ku qut bû, Yekîtiya Neteweyî jî Kongreya Neteweyî jî baştir pêk tê. Ji bo vê yekê ev êriş wê yekîtiya neteweyî li ser bingehê rast û dirust ava bike û birakujîya ku heta niha dibe jî radike. Yanî ev êriş ne birakujî ye, lê li dijî xiyanetê ye û birakujîyê xelas dike... Di vî warî de, yanî ji bo federasyonêke demokratîk YNK bédeng dimîne, an wisa diyar e, an jî eşkere li dijî dernakeve.

AHMED XALIT

Diyaloga Sokrates, Maxo, Rewşenbîr û Serok (4)

TÊKOŞÎNA RAMAN Û MEJÎ

SOKRATES: Ya rastî ez Maxo nas nakim, cara yekemîn e ku ez wî dibînim.

SEROK: Min digot qey hûn hev dinasin, ji ber ku ew xwe zû nêzîkê mirovê mîna te dike û heya jê bê, dixwaze dîrî me bixîne.

SOKRATES: Çawa?

SEROK: Herî baş ew e ku tu bi xwe pê re sohbet bikî

SOKRATES: Ezê gelek dilxweş bim, ger bikaribim ji wî hin tiştinan fêr bibim.

SEROK: Em hêvî bikin, belê ka were Maxo, tu Sokrates dinasî?

MAXO: Fermo Serokê min, ser seran; eger bixwazî emê wî binasin.

SEROK: Bawer nakim tu wî binasî. Lê hêviya min, tu dostaniya me pê re daniye, xera nekî!

MAXO: Na, Serokê min.

SEROK: Sokrates rewşenbîrêkî yewnanî ye...

MAXO: Serokê min ev rewşenbîr tu car nabin mirov...


SEROK: Çima, qiloçên wan hene? Beriya mirov gotina xwe li ser tiştan bi dawî bîne, tu hema biryara xwe li ser wan didî. Daxwaza min tu hinek bi Sokrates re sohbet bikî, paşê emê dîsa bîn ser mijara xwe.

SOKRATES: Maxo, te got, "Rewşenbîr tu car nabin mirov", ez dixwazim bizanibim, gelo ka rewşenbîr çi ne, çi karî dikin?

MAXO: Binêre hevalê delal, wer dixuye ku haya te ji rewşenbîran hiç nîn e. Divê mirov beriya her tiştî welatparêz be. Bi ehlaqê burjûvayê biçûk kesek nikare bibe welatparêz, ji bo welatê xwe xebat bike. Rewşenbîr ew e ku, bersiva pirs-girêkên gelê xwe bide. Ma rewşenbîrên me wisa ne? Na, ew mîna axayan e, dixwazin rehet wan li cih be û navê wan mezin be.

SOKRATES: Tu qala tiştên gelek girîng dikî mamoste Maxo. Te got bersiva pirs-girêkên gel, tu dikarî çend mînakan bidî da ku, ez baştir têbigijim, mebesta te çi ye?

MAXO: Li welat gelek nixên gel hene, gelê me zehmetkêş û perîşan e; gerek mirov vî geli nas bike, fêr bike, ji derdên wî re bibe melhem.



SOKRATES: Baş e. Mîna tê digijim gelê kurd di bin zordariyeke mezin de ye. Pirs min ev e; li anegora ramana te çare çi ye? Bersiva pirs-girêkan bi çi awayî divê bê dayîn?

MAXO: Binêre tu naxwazî fêr bikî. Ji bo kesên bixwazin fêr bikin, mesele gelek vekirî ye, tu çima pirs di devê xwe de dibî û tînî?

SOKRATES: Mebesta min têgîştina meselê ye. Lê tu bersiv nadî min, tenê qala zor û zehmetiyê dikî. Ez dixwazim çare çi ye, bizanibim.

MAXO: Tênegîştina vê meselê çi ye? Jixwe hûn hemû rewşenbîr wisandin. Gava hûn devê xwe vedikin pir mezin dipeyivin, lê gava mesele çareserîya pirsê be, bersiva demê be, hûn ji kar direvin. Kî zane gelê we ji destê we çi dikişîne!

SOKRATES: Daxwaza min jî, fêrbûna riyên çareseriyê ne.

MAXO: Ma evqas zelal e û ku tu dîsa jî, tê nagijî, ez çi bikim? Heval, birêz mamoste, navê te çi bû?

SOKRATES: Sokrates, Sokrates mêrê Xanthippe.

MAXO: Ha hevalê birêz Sokrates, divê tu ji bo gelê xwe bixebitî. Pirs kurdan giran e, dev jê berde, serê xwe pê neêşîne, têgîştina pirs kurdan e.

REWŞENBÎR: Mamoste Maxo, dîsa jî, mirov hinek zelal bike, ji bo dostên me baş dibe. Sokrates filozofekî yewnanî

yê bi navûdeng e...

MAXO: (Bi dengekî nizm ku Sokrates nebihîze) Çi karê vî bi me heye. Filozof e an serê xwe xwariye, an jî li ser hesabên biyaniyan dixebite. Ne wisandin e heval?

REWŞENBÎR: Bawer nakim, rewşenbîrêkî gelek giranbiha ye...

MAXO: Jixwe ev hewesa we rewşenbîran a li ser biyaniyan, mal li me kurdan şewitandîye. Ji bo hûn jî, ji wezîfeyên xwe birevin, hûn xwe dispêrin felsefeyê, xwe li serê me zana dihesibînin, nivîskar...

SOKRATES: Dengê we baş nayê min, ger hûn dengê xwe hinek bilind bikin wê baş bibe.

REWŞENBÎR: Belê, heval Maxo, hûn dikarin sohbeta xwe bidomînin.

SOKRATES: Em hîn li ser bersiva pirs-girêkan mabûn. Gelo mirov nikare bibêje ku divê her kes li ser beşa xwe, bi awayekî xwe kûr bike, bibe pisporê karê xwe ku berjewendiyên wî zêdetir bibe?

MAXO: Rast e, divê wisa be, lê ka?

SOKRATES: Eger her kes di karê xwe de şarezaya be, ber bi pisporî biçe, hin bersiv dernayên holê? Çareserîya pirs-girêkan hin asantir nabe?

MAXO: Tu çi dibêjî, ma kî naxwaze wisa be. Lê bawer bike rewşenbîrên me ne di karê xwe de ne jî, di karên din de tu tişt nizanin; tiştên zanin jî, nakin.

SOKRATES: Çima nakin, an jî, çi zanin û nakin?

MAXO: Ma mirov bixwaze çi nizane!

SOKRATES: Baş e. Em li cihekî nêzîkê hev dibin: Mirov bixwaze dikare fêr bibe, tiştên fêr dibe jî, dikare bixwe jiyane...

MAXO: Rewşenbîrên me ne fêr dibin, ne dikevin jiyane.

SOKRATES: Jiyana çawa?

MAXO: Jiyana xizmeta gel.

SOKRATES: Maxo, tu timî li der û dorên tiştan digerî, naxwazî pirsê binasî, nahêlî mirov bersiv jî bide.

MAXO: Ma bersivên te ji yê din ne pir pêştir in, tu jî mîna rewşenbîran, çareseriyê di gotinan de digerî.

SOKRATES: Gotin nebe çareserî nabe! Divê mirov berê plansaziya çareserîya pirs-girêkan derxe û paşê jî, li ser bifikirê, ka wan çawa bixwe jiyane. Tu ne bersiv didî, ne jî, dihêlî em bersiv bidin.

MAXO: Ma bersivên tuyê bidî çi ne? Ew jî ne gotin in, tu çi bibêjî ji bo min kêrî pênc qurîş nake, mesele pratîk e. Mesele jiyane. Tu di jiyane de hebî baş e, wekî din heta sibê tu bipeyivî jî tu mane nade.

SEROK: Maxo!
MAXO: Belê, Serokê min.

SEROK: Tu nahêlî kes ramana xwe jî, bibêje.

MAXO: Em gelek demokrat in Serokê min, her kes dikare gotina xwe bibêje.

SEROK: Lê tu mîna

Şûrê Demokles li ser serê wan bî, kes nikare rehet ramana xwe bîne ziman, ne wisa ye?

MAXO: Belê, wisa ye Serokê min, lê mirov rûdide wan, derdikevin ser serê mirov.

SEROK: Sebra te nîn e, tu guh bidî Sokrates, bawer nakim ku bi vî awayî demokrasiya te têr û kêrî rewşenbîrên kurdan bê. Divê em xwedî li hemû beşên gelê xwe derkevin. Rewşenbîr jî, beşek ji gelê kurdan in.

MAXO: Lê em rexne nekin, ew tu karî nakin...

SEROK: Rexne divê li ser bingehê pêşveştinê be, ne ku bi paş ve bikişîne.

REWŞENBÎR: Serokê min, heval birêz Maxo, gava rexne dike, xwe dixwe cihê we, şûrê we digire destê xwe û li serê me dixwe.

SEROK: Çawa? Kes nikare bi şûrê min li kesî bixwe!

REWŞENBÎR: Pir caran kesên din, gava rexne dikin, xwe dispêrin bin perdeya rexnesiwanê we. Gava kesek bi şûrê we şer dike, heqê şûrê we nikare bide. Ew şûr tenê di destê we de xurt e, bi tesîr e. Di destê kesên din de tesîreke ters şanî dide.

SOKRATES: Rast e. Her kes dikare bi şûrê xwe şer bike. Mînak, dema Îskenderê Zulqerneyn şûrê xwe bigirta pir xurt bû. Tu kes nikaribû bi şûrê wî şer bike. Rojek yek ji generalan wî xwest bi şûrê wî şer bike, Îskender bi şûrê xwe

serê generalê xwe jê kir.

REWŞENBÎR: Bawer im Sokrates şaş fêr kir, mebesta min bi şûr.

SEROK: Sokrates şaş fêr nekî, tu jî mîna Maxo neke; wer dipeyive ku dibêje qey Sokrates tê nagije. Hûn hîn Sokrates nas nakin, ew her tim meydana şer gelek fireh digre, heta dijmînê xwe tê de biwestîne û paşê wî serpiştî li erdê dixwe. Tu û Maxo serpiştî li erdê ne, lê haya we jê nîn e.

SOKRATES: Spas, ya rastî tu min ji min jî çêtir zelal vedikî; tu didî şermê. Ez ji te pir tişt hîn dibim.

SEROK: Li qusûra Maxo û Rewşenbîr mêze neke, dilê wan paqij e, lê serê wan tiştan dereng digire. Ewê rojek peyva te ya îro fêr bikin.

SOKRATES: Hêvî dikim!

SEROK: Maxo, li ser rewşenbîran heqê wî yê rexnekirinê hebe jî, rîya rexneyên wî ne rast e; mirovan direvîne, nêzîk nake. Rewşenbîr jî, pir mizmizok e, mezin nalize; em dixwazin ew pir mezin be.

SOKRATES: Gava rexne ji hêla te tîn, bawer nakim ku kes jê aciz be. Mesela, divê herkes hêz û sînoren xwe bizanibe. Wer dibînim ku di vî warî de kêmasî hene.

SEROK: Dêrê me jî, em dixwazin ev kêmasî ji holê rabin. Ev kêmasî nabin, rê ji mirovên mîna Maxo re jî, tê girtin.

REWŞENBÎR: Hûn peyvên gelek rast dikin!

SEROK: Ya şukur ku tu jî, hêdî hêdî tê digijî û muhura xwe lê dixî

MAXO: Serokê min, ji xwe karê Rewşenbîrên me muhur li dest be, lê ne kirin be.

SEROK: Karê te jî, xerakirina navbera me û rewşenbîran e!

MAXO: Em dixwazin wan bixin tevgerê.

SEROK: Nekeve navbera me û xera neke, bes e.

S O K R A T E S : Têkoşîna raman û mêjî, ji têkoşîna çekan dijar-tir e.

SEROK: Ger mirov baş pêk bîne.

SOKRATES: Belê ger mirov baş pêk bîne!

A. YEZDAN

ÇÎROK

HÊSTIR

Hêstir, kurteçiroka M. Hemo ye û di pêşbaziya Koma Xanî ya Çand û Wêjeyê de xelata sêyemîn standiye. Encama pêşbaziya di 3'ê tîrmeha 1995'an de li Helebê diyar bûbû. Di vê pêşbaziya kurteçirokan de Suut Kılıç xelata yekemîn ya duyemîn jî Fewaz Evdî wergirtibû û me ew weşandibûn. Niha jî em vê kurteçirokê pêşkêşî dêhna we dikin.

Îbo kurekî pênc, şeş salî ye, lê mirov dibêje qey guleke Lzêrîn e, gul û kulîlk ji ber bêhn teng dibin, ji bextreşiya wî bûye kurê karkerekî, ne bûye kurê şah û merîşalan. Li kolanê listika xwe dike ta roj xwe jê vedidize, ew jî dikeve hêlîna xwe, sibeyekê jî nivîna xwe kişî bê taştîyê bixwe, berê xwe da kolanê.

Dayîkê: Îbo! Eger tu kincên xwe, gemarî bikî, ezê te li der-va bihêlim, derlingên xwe ve-male, bila çirav ne gihîniyê. Li pêşiya dûkanan, Îbo Ciwan dît, Ciwên got: Îbo, heba min neman dêşe, wê siba çê bibe.

Îbo: Tu ji ku zanî?

- Belê, ez zanim, dayîka min ez birim li ba şêx, bavê min jî dike min bibe ba dîktor.

- Dîktor ne baş e, darziyan li mirov dixîne.

- Na şêx ne baş e!

- Na şêx baş e derzî li min nexist bes tûyê heba min kir.

Îbo û Ciwan bi listika xwe mijûlbûn, bayekî tûj jî bi tîrê-jên rojê re dilîst, duman ji axê hildikeli, baharê çavên xwe kil didan. Xelkê taxa Şêx Mexsût bi tidareka Newrozê mijûl di-bûn.

Diya Ciwan, kûzê ku Ciwan û xuşka wî Jînê tê de pere dighandin hev, şikand, bi destê Jînê girt û berê xwe dane sûkê, ji şabûna cilên nû yên Newrozê re, Jînê di pêşiya dê de dilîst. Li ser lingekî hildipekî, nêzikî li Ciwan kirin, Ciwan û Îbo bi listika xwe de ketibûn. Ji cihanê cuda bûbûn, diya Ciwan gihîste kurê xwe gotê: Rabe kurê min ezê kincê Newrozê ji te re bikirim. Bi wê gotinê re tîlûreke zêrîn bi şahiya wî re, firî. Ketin hûndirê dikanê, Îbo jî di deriyê dikanê de rawestî û bi hêviyeke sêwî li wan mêzekir. Wan cilên xwe kirin, li xwe kirin, di rengên

cilan de xemilîn. Her ku Îbo li cilan mêze dikir cil vê re kenîn, lê didilê wî de xemgîniye-ke bêbinî avjenî dikir. Îbo ji cih bi beza xortekî berê xwe da mal civîq û çirav ji ber lingan dipijiqî û wek zîpikan bi ser de dibarî, derî bi hêz kuta, ji pey hev kêmkir.

Dayîkê destê xwe da ser dilê xwe û bi lez derî vekir, bi vekirinê re Îbo got: Dayê kincên Newrozê!!

Dayîkê: Wax, hey nemawo te dilê min qetand, bê ev çî çirav û herî ye? Te xwe riswa kir, min duh kincên te şuştin û dest lê hilda ku kulmekî pê vede.

Îbo got: Kincên Newrozê, kincên Newrozê. Bi gotina Newrozê re, pî li dê sarbûn, ji dêla lêxistinê xwe bi ser de xwarkir ku wî ramûse, Îbo: Na, na, ka we kincên Newrozê ji me re kirîne? Bi vê gotinê re ramûsa dê, di lêvan de miçiqî û kirasê xizaniyê li ber çavên wê li babûn, kincên Newrozê!! Îbo got:

- Erê, diya Ciwan ji zarokên xwe re, ji dûkanê kirîn.

- Ê, kurê min, niha bavê te wê ji kar vegere û ê ji we re bikire.

Îbo, biderket, çû cihê ku bavê wî ji turmbîla kar peya dibê, rawestî li ber tûjiya sermê,

pişta xwe da dîwarekî, xwe qufiland, riya bavê xwe pa û pa, çav ji rûyan biderketin, pêş da çûn, hişê wî jî bi xweşikbûna cilan re winda bû, turmbîl hat, bavê Îbo jê peya bû, bavê wî dît lê wî bav ne dît. Bavê gotê: Tu li çî digerî kuro, Îbo veciniqî, çavên xwe ji pêş kişandin, hişê xwe topkir, xwe avête hambêza bavê û got: Ez kincên Newrozê dixwazim!!

- Kincên Newrozê?! ew çî kinc in?

- Bavo! Ew li dûkanê hene, wekî kincên kalo ne, pîrr rind in, here meşe bine.

- Ê, kurê min, Ê, ezê li dawiya mehê mehaşê xwe bistînim û ji te re bikirim.

- Na bavo ji xuşka min re jî.

- Ê, kurê min, Ê.

Her roj, Îbo diçû deriyê dûkanê, cilên xwe û xuşka xwe nîşan dikirin, bi rengên wan çavên xwe kil didan û qet nizaniyê Cejna Newrozê berî dawiya mehê ye. Li ber sifrê rûniştibûn, berî Îbo pariyekî têke devê xwe, got:

- Bavo siba dawiya mehê ye?!

- Na kurê min, na.

Bavo, ezê jî bi te re herim kar, ji bo tu peran bistîni, pê kincên Newrozê ji me re bikire.

Keçkê: Belê, bavo, belê ji min re jî bikire, ji bo roja Newrozê ez xweşdilan kim, ez çiqas ji kincên Newrozê hez dikim.

Bavo: Kurê min. Em perên xwe tev bi kinc bidin, emê pişt re xwarina xwe ji ku derê binin?

Îbo: Bavo, em xwarinê naxin!!

Keçikê: Emê xwarina xwe ji mala kalo binin. Ger bavo kincan ji me re nekire, emê nanê hûrik ji erdê berevkin, emê pera li erdê bibinin û pê bi kinc bidin.

- Îbo, ezê nanê şewitî jî bixwim, ji ber ez peran bibînim.

Keçikê: Îbo! roja em biçin Newrozê, em li erdê rûnanin. Ji bo kincên meyî nû bi qirêj nebin, ne!?

Dayîkê: Dê husk in (we hîna hesp neaniye hûn êfir çêdikin).

Zîrkbûna zarokan dilê dayîkê vedijiyand û xizaniyê jî ji aliyekî ve, dil diçelmisand. Ji ber sifrê vekşî çû çayek da ser xazê, çaya wê jî wek hundirê wê keli, lê keldûmana çayê hildigerî di ezmên de sar dibû, histirên wê jî dadigerî di erdê de sar dibûn. Kela çay rijî, kela wê nerijî, çay anî û wekî dayikek sêwiyan pişta xwe da dîwêr, mêr lê meyzekir, zanî-

bû xemgîniya wê ji bo çî ye. Mêrik got:

- Ax, ax! Emê kengî xwe ji vê xizaniyê xelas bikin? Ev du salê min derbasbûn, ku ez karekî din dibê karê xwe re bibînim, lê bê çare ye, ma me gunehek kir, me ev zarok bi dinê xistin? Bila zarokên me jî wekî zarokên xelkê, rojekê şa bijîn. Ev çî dem e lêê, ev çî dem e. Nema kes peran bi deyn jî dide, divê ez çarakek bibînim. Roja din di nivê şevê de vegeerî, çare giş, ji destê wî winda bûbûn, xwe xiste nav cihê xwe, fikirî çav di serî de fireh bûn, bi wan dilopên gerim, ku bi ser dest de rijîne, rûnişt, "Ev çî ye lêê, ev çî girî ye; bes e, te dilê min qetand, bes e."

- Divê tu siba kincan ji zarokan re bikirî. Her sibê, Îbo wekî her car, diçû deriyê dikanê, dil û cegerê xwe li wir dihiştin û vedigeriya.

Dayîkê: Divê tu kincan bikirî. Ha ji te re vê gistilê bifroşe, pê kincan ji zarokan re bikire. Ezê çawa vê xelata hêja bifroşim?

- Rast e ev xelata pir biha ye, ev gistîla nîşanê ye, min got ez naxwazim, ez wê nafroşim, lê zarokên min û ken û şahiya wan jî, xelatek bihatire, divê tu gistilê bifroşî.

Bû roja din gistil firoto û vegeriya mal, bi rê de dihat û ji xwe re digot: Erê kezêb pir şêrin e, gava ew nexweş bûye, bê derman mayî gistil nefrot, lê ku zarokêkî wê ba, wê ew bifrota. Gava gihîste mal ken û kevok ji rûyan difiriyan, bi sirûdeke şahiyê got: Îbo, de xwe amade bikin, em herin kincan ji we re bikirin, li zarokan bû govend û dîlan, ketin dikanê û cilên Newrozê xwestin, xwediyê dikanê dest avêt refê, Îbo got:

- Na Apo kincên min di camê de ne, xwediyê dikanê kincên camê jê re derxistin û dan dest. Îbo û xwişka wî bûn dildarên ku destên xwe bighînin yarên xwe, lê bi şahiyên wan re, sê turmbîl di deriyê dikanê de sekinîn, leşkerên bi tiving jê daketin, cilên Newrozê giş top kirin û birin. Îbo xwest cilên xwe birevîne, leşkerêkî dest avêt kincan û birin. Îbo li erdê dirêj bû û bang kir, "Kincên min nebin, min nedizîne, perên bavê min hene, bavo ka peran bide wan, destê xwediyê dikanê xistin kilapçekê û tev cilan birin zîndanê. Gava ew meşiyên, Îbo qêrînek da xwe û xwe avêt dawa diya xwe û got:

-Dayê ev leşkerên pîs, kincên min birin.

Histirên xizaniyê rê dan histirên zordestiyê, histirên dayîk û zarokan hevdu hem-bêz kirin û germ kirin.

M. HEMO

PEN'a tirk

li Yaşar Kemal xwedî derket

Serokê komeleya nivîskaran PEN'a tirk Şükran Kurdakul û Sekreterê Giştî Alpay Kabacalı lêpîrsîna ku DGM'ê der heqê nivîskar Yaşar Kemal de vekiribû, rexne kirin. Lêpîrsîn ji ber nivîseke Yaşar Kemal a li ser rewşa kurdan bû û di rojnemeyêke îtalî de hatibû weşandin.

Kurdakul û Kabacalı li ser vê meseleyê daxuyaniyek dan çapemeniyê, di daxuyaniyê de dan zanîn ku Yaşar Kemal di vê nivîsê de biratiya gelan aniye zimên. Wan got: "Ne tenê Yaşar Kemal, li

Tirkiyeyê kî qala hebûna kurdan dike, der heqê wan de lêpîrsîn û doz tê rojevê. Tiştên ku Tirkiye dike, di hîqûqa Dema Navîn de jî tu mînakên wê nîn in. Dîsa di daxuyaniyê de tê gotin ku tiştên wisa îmajê Tirkiyeyê xera dikin, her wisa jî bawerîya hemwelatîyan ya bi dewletê dişikîne. Rayedarên PEN'ê daxuyaniya xwe wiha diqedînin: "Em careke



Nivîskar Yaşar Kemal ji ber fikrên xwe yên "cudaxaziye" tê mehkemekirin.

din bang li rayedaran dikin da ku werin mercên peymanên navneteweyî yên ku Tirkiyeyê jî pejrandiye, pêk bînin."

Serwîsa Çandê

Xelatên Musa Anter û Şehîdên Çapemeniyê hatin dayîn

Encama musabeqeya Xelatên Musa Anter û Şehîdên Çapemeniyê ya sêyemîn diyar bû. Musabeqe îsal ji aliyê rojnameya Yeni Politikaya ve hate lidarxistin. Di 20'ê rezberê de, li Stenbolê, li Navenda Çanda Mecidiyeköyê bi beşdariyeye mezin, kesên ku xelat qezenc kiribûn, xelatên xwe wergirtin. Musabeqa di 4 waran de hatibû çêkirin. Li gorî vê, encama îsal wiha çêbû.

Nûçe: Xelata yekemîn nûçeya Ergun Aksoy ku di 11'ê kewçera 1994'an di rojnameya Cumhuriyetê de bi navê "Dewlet gundan dişewitîne" derketibû, xelata duyemîn nûçeya Yusuf Özkan ku di 12'ê gulanê de bi navê "Nexweşiya Güneydoğu" (Rojhatê başûr) hatibû weşandin, standind di eynî rojnameyê de. Tu nûçe layiqî xelata sêyemîn nehatiye dîtin.

Lêkolîn-Lêgerîn: Xelata yeke-

mîn Mustafa Kalkanli bi nivîsa Kemalîzm: İdeolojiya derew û inkarê"; Xelata duyemîn Faik Bulut bi "Ji pênûsa Ehmedê Xanî dinyaya kurdan a ku nayê zimên" û xelata sêyemîn Erol Anar bi "Di çarçeweya dîrokê de li Tirkîyeyê mafên mirovan" standin.

Fotograf: Ji bo xelata yekemîn tu berhema layiqî nehatiye dîtin. Xelata duyemîn Kerem Ilgaz, bi fotografê ku babeta wê "polis" bû û xelata sêyemîn jî, Tamaşa Dural bi fotografê ku babeta wê "Kê ev tetik kişand", standin.

Karikatur: Xelata yekemîn Aşkın Ayrancıoğlu bi karikaturê ku der barê "Otosansur"ê de bû, xelata duyemîn Behîc Ayrancıoğlu û xelata sêyemîn jî Yaşar Babalık wergirtin.

Xelata taybet a rûmetiyê: Xelata îsal a rûmetiyê jî di navbera malbata Hasan Ocakê ku hatibû kuştin



Hale Anter

û li ser navê malbatên girtiyan Firdavs Çelik de, hate dabeşkirin.

Ji bo musabeqeya îsal a sêyemîn, filmekî dokumanter hatibû hazirkirin. Di vî filmê de li gel jiyanê Musa Anter, fikra kesên ku wî ji nêzik ve nas dikirin jî hatibû standin. Di vê şevê de hêleke baş jî zimanê filmê dokumanter bû, yanî kurdîbûna wê bû.

Di şevê de tevî gelek mêvanên naskirî û jina Musa Anter, Hale Anter jî hebûn. Wekî tê zanên Apê kurdan Musa Anter, di 20'ê rezbera 1992'an de li Amedê ji aliyê kontrayan ve hatibû kuştin. Rojnameya Özgür Gündemê, ku hate girtin, ji bo bîranîna wî û ya şehîdên çapemeniyê, di 20'ê rezbera 1993'yan de, bi gotineke din, di yeksalvegera mirina wî de musabeqeyeye wiha li dar xistibû. Musabeqeya duyemîn, ji aliyê rojnameya Özgür Ülkeyê ve, ku di sala 1995'an de hate girtin, di sala 1994'an de hatibû çêkirin. Organîzasyona îsal jî, ji aliyê rojnameya Yeni Politikayê ve, ku di nav sala 1995'an de dest bi weşanê kiribû û dîsa di eynî salê de hatibû girtin, hat çêkirin.

Serwîsa Çendê



Kesên ku xelatên îsal standine bi hev re têne dîtin.

Kurê min

nedîtibûya.

Kurê min, çavreşê min,
Hêstirên ewrên reş,
Asmanê şîn û mizgîniya biharê,
Bazê çiyayên me yê bilind...

Kurê min,
Ewqas kûr e kesera te,
Bawer bike dilê min bûye kevir
Yekcar dibe hezar parçe
Nikaribû li ber xwe bide lê,
Li ber xwe dide dilê dayika te.
Rojka ku çavên te
Xatir xwestin ji min,
Min zanibû
Tu venagerî careke din.
Tiliya te ya bêhine
Wê bilive li ser qebza keleşê.

Zivistanê bi berf û baranê re
Biharê bi bêhna bineşan re
Havînê bi germa tebxê re
Di dawiya şeva sar de
Ez digirim silavên te...
Ji tiliya te ya ku xwar e li ser

tetikê!

Kurê min,
Xwezî li şûna parçeyekî nan
Me welatekî serbixwe dabûya

we.

Xwezî,
Li cihê ku bedena we diket ser

axê

Leşê me bûya û we axa sar

Kurê min,
Ez dizanim,
Ger tu lê nexî ev zilm dawî lê

nayê.

Ger tu neşkênî zincîran
Ev koletî dawî lê nayê!

Kurê min, çavreşê min
Ez dibînim ku
Axa me hatiye dagîrkirin.
Diroka me bindest e û
Em hatine înkarkirin.
Dest avêtine namûsa me
Hatiye parçe parçekirin.

Min tu,
Bi şîrê xwe yê tal xwedî kiriye
Lê serkeftin,
Taca zêrîn e li ser eniya te.
Zincîrên li can û bedena te, êdî,
Di bin şûrê te yê tûj de ne.
De lê bixe,
Bi hêrs, bi mêranî
Lê bixe bi evîna Kurdistanê!

Kurê min,
Heke parçeyek mafê min heye

li te

Bila xweş helal be li canê te.
Lê ez çî bikim kurê min,

Ez neçar im egîdê min.
Min nedixwest ku lingê te
Li kevirêkî jî bikeve.

Lê niha,
Li dijî barbarên mezin û

xwînswar

Tu ketiyî şerekî bêaman û dijwar.
Xwezî li şûna parçeyekî nan
Me welatekî serbixwe dabûya

we.

Xwezî,
Li cihê ku bedena we ket ser axê
Leşê me bûya û we axa sar
nedîtibûya.

Lê hêvîdar be kurê min,
Vê destana mirovahiye,
Vê evîna bêaman,
Vê bahozê, vê tofanê
Tevde dinivîsinin
Rojka azadiyê,
Serxwebûnê û xweşiyê
Li ser axa Mezra Botan!

Kurê min,
Ewqas kûr e kesera te, lê,
Welat dijî di dilê min de.
Ev egîdiya te,
Kurdistan nîşan dide,
Di awirên çavan de...
Ez wan çavan radimûsim
Radimûsim!

NURAY ŞEN

DEFTER

Êdî kî bikaribe xwe rizgar bike



AMED TIGRÎS

Di roja 17'ê vê mehê de li Swêdê ji bo Parlemantoya Ewropayê hilbijartin çêbû. Gelek partî û grub beşdarî hilbijartinê bûn. Di nav wan de bi navê Sarayevolîstan (Lîsteya Sarayevo), ji Yûgoslavyaya kevin jî rêxistinek beşdarî hilbijartinê bû. Di dawiyê de jî, li seranserî Swêdê % 1'ê dangan girt. Lîsteya Sarayevo her çiqas parlementer dernexist jî, lê dîsa, li Swêdê % 1 girtina dangan serkeftin tê hesibandin.

Di van salên dawiyê de, li gelekî welatên Ewropayê kurd di hilbijartinên belediyan de hatin hilbijartin. Li Swêdê, di Partiya Sosyal Demokrat de, Nalîn Baksî jî wekî parlementer hate hilbijartin. Niha ew di parlemantoya Swêdê de ye.

Hilbijartina kurdan hem di belediyan û hem jî di parlemantoyan de gelekî baş e. Û destkeftineke nû û girîng e. Lê, eger ew kurd, ji bo doz û berjewendiyên neteweyî û welatê xwe, kê mîne jî, hinek hewl bidin û kar bikin, wê wezîfeyeye xwe ya pîroz bi cih binin. Lê, ku rewş û helwesta wan ne wiha be, bi tenê wekî hemwelatîyekî/e wî welatî be û ew xwe wekî hevalên xwe yên belediyan an parlemantoyê bibînin, wê demê tu kar û feydeyekê wan ji kurdan re tune ye.

Hinek kurd hene ku di cihên wiha de cih girtine û xebatên baş jî kirine û dikin, gotina min ne ji bo wan e. Ji kesên wiha re mirov dikare bibêje wan ji xwe re li Ewropayê ji bo debara xwe karekî baş dîtine. Ferqa wan jî kurdekî ku ji xwe re di fabrikeyekê de an jî di aşxaneyekê de kar dike, tune ye. Lê ji aliyê welatperweriyê

ve ferqa karker û wan kesên siyasî hene. Karker dibêje "Ez kurd im, zilm û zor li ser welatê min heye" Lê, ew kesên ku di parlemantoya an jî di demê dezgehên dewletên ewropî de cih girtine, dema kamarayên TV. û mîkrofonên radyoyan dirêjî wan bê kirin û heger ew bibêjin "Na ji min pirsên wiha nekin, ez ewrûpî me, li ser vî welatî pirsan ji min bikin.", gelo mirov çî navî li van kesên wiha bike baş e? Hem jî, bi ser de ev kesên wiha û derdorên wan di sohbetên xwe de, kurd û kurdperweriyê ji kesî re nahêlin! Bi her rêxistin û karên fedaker û kurdperwer, henek û qerfên xwe jî bikin.

Heger piçek be jî, hestên kurdîtiyê di kesên wiha de mabin, dê ji parlementerê tirk Özdemiş ku di Parlemantoya Almaniyayê de ye, çawan li dijî dewleta tirk car caran dengê xwe derdixe ders, îbret û cesaretê bigirin.

Mirovên kurd çiqas xwe û rastiya xwe zû ji bîr dikin. Mirov dibîne ji nav birçîbûn û tunebûnê direve, hema çend roj paşê wê rewşê ji bîr dike. Ji nav agirê top û tîfingên tirk, ereb û eceman direve, bi sedan malbat, gundî, bajarî û hemwelatîyê xwe şehîd dide, dema ew xwe ji wê cih û rewşê xelas dike, di cih de her tiştî ji bîr dike. Êdî li dê û bavê xwe jî nafikire. Wey li wî, kê xwe xelas kir.

Felsefeya ku "Êdî kî bikaribe xwe rizgar bike!" Bi yê mayî jî çî dibe bila bibel!

Serkeftina we rûmeta me ye!

Zarokên welatê birîndar; êdî destpêka sala nû ya xwendinê ye. Dibistan vebûn, çûn û hatina we ya rojane nêzîkî neh mehan ji niha û pê de dest pê dike. Di van neh mehan de ji bo serkeftinê hûnê bê rawestan bixebitin. Her êvar, ji bo rojhilateke nuh di vê hûn xwe amade bikin. Ji ber ku ne bi zimanê xwe yê zikmakî û ne di dibistanên xwe de û ne bi şeweyekî azad û bêtirs hûn dixwînin, em giraniya barê we baş dizanin. Lê dîsa jî baweriya me bi we û bi serkeftina we heye. Ji ber ku hûn zarokên Zagrosan, di kar û barê serkeftinê de jîr û hurnermend in.

Gelî hevalan; di çûn û hatina xwe de, di rabûn û rûniştina xwe de û bi taybetî di xwendina xwe de, pêdiviyê hûn gelekî zîrek û hişyar bin. Di tevaya dibistanan de yên herî zîrek û serkeftî divêt hûn bin.



Ji bîr nekin ku hûnin berpîrsên sibehê. Ji bîr nekin ku hûn in rûmet û serbilindiya bav û kalkan. Û ji bîr nekin gelî

zarokên welatê wêranbûyî, ku hûnin hêviya keser û kedera hezar salan...

Gelî hevalan; helbet,

hemû demên we bi xwendinê derbas nabin. Carcaran hûnê bigerin, bileyizin jî. Carinan bi destegul, carinan bi

çavgişkê. Ji bo ku kî bibe mak, ango dora kê ya çavgiştinê be, hûnê hevdu bijimêrin. Vêca, berî dawî lêanîna nivî-

sîna xwe ya vê heftiyê, ji bo jimartinê ku wê kî bibe mak (ebe), em vê nivîsîna li xwar diyarî we hêjayan dikin. Her wisa, ji niha û pê de ji me re nameyên xwe bişînin. Bi hêviya rojên azad û serfiraziyê, şad û bextewer bimînin.

Zarok tev de mîna daîreyekê pêktînin û zarokek, pêşî tilîka xwe du-sê caran li lêva xwe dixê û dest bi jimartinê dike heta ku zarokek dimîne, ew dibê mak û ên din xwe vedîşêrin:

*Yeka yeka dil didim,
her du çavan kil didim
Kil ji kilê buharê, tav ji
tava çinarê*

*Çinarî meqesok e,
serê lawik b'dersok e
Keça kafir beraz e,
yekî ereb dixwaz e
Çilqeytanê rengînî,
kofya hirçê zêrînî
Hirç fêr bûye ser textan,
çav nabîne ji rextan
Li çiyayên hevgiştî,*

*Çûm ser bîrek devgiştî
Du gul tê de pişkiwtî,
yek dost û yek dergistî.*

DILDAR ŞEKO

D Î T I N Ê R A M A N

Jey ray est o

No çend rojî yo, rojnameyanê tirkan di ambargoyê çiyê werdenî ser o bol nuştêv (yaziy) yeni nuştîş.

Ambargaoy ser o herkes gore bê xwi çiyê vano. Waliyê Dêrsimî vano "Ma tena ebi reya ambargon şêne gerîlayn berê!"

Kurdistan di ambargoyê werdenî çiyê newe niyonde pancês serrî yo kî politikaya dewleta tirkan wina ya. Gore bê politikaya dewlet, eke dewijî veyşan bimanê, gerîllay zî veyşan manênê û yenê teslîm bene.

Tawro hîrê hinzarî dewê kurdan amey xirabeno veşnayış. Dewijî amey surgun kerdiş. Veyşan, viran şaristananê tiran ra biyo. Labelê Kurdistan di lej kemî nê-

biyo, hina vêşî biyo.

Hergû roj nizdiyê se kesan venê kiştên. Tabutê eskeranê tirkan tim û tim ray ra yê. Ez wazena vaja lez nebiyo, hina xidar biyo.

Dewletî ambargoyê çîdê werdenî ronayo. Dewletî kurdanê sivîlan kişena, dewan veşnena, veng kena.

Nê çiyê ki dewlet kena, suc o. Sucê merdim ra. Ganî (gerek) mêrdim nê sucan ef nêkero. Meselay kurdan, ambargoyan reyra hal nêbeno. Jew ray esto: Dewlet û PKK ganî roşî na mesela hal bikere. Sewbi ray çînyo.

YILMAZ POLAT

Yekîti û serkeftin

Dibêjin ku ji bilî rojnameya Welatê Me, gelek rojname û kovarên din hene. Ez bi navgîni-

ya Welatê Me, silavên xwe pêşkêşî tevaya rojnamevanên kurd dikim. Di baweriya min de (her) serkeftinek bi yekîtiyê dibê. Lê belê di nav weşanên kurdî de gelek kêmkasî hene. Hinek çewtî bala min kişand. Yek ji van jî pirtûka Prof. Celîlê Celîl e. Digel rêzgirtin û daxwaza min ya bexşandinê ji Mamosta Celîl, min pirtûka wî ya bi navê (rêza çîrokên zarokan) ku di Gelavêja 1992'an de hatiye weşandin xwend û her wisa tefsîra Qur'anê ji wergêrîna Seyda Abdullah Varlî, min di rojnameya Welatê Me de xwendibû. Gotîna min ji nivîskar, zana û mezinan re ev e; Bes e êdî, gereke her kes li gor dilê xwe nenivîse. Navenda Çanda me heye. Bala navenda çandê bikîşînin, (heger) çewtiyek hebe jî bila bê rastkirin.

Di navbera rojnameya RONAHÎ û Welatê Me de jî dijberî heye. Lazim e zimanzanên kurd li hev bicivin, lêkolînekê bikin û ji bo yekîtiya ge-

lê kurd, kîjan alfabe asantir be lazim e pêk bînin. Ez hêvîdar im ku wê yekîti di nav me de çêbibe.

ZEKÎ BAZIDÎ

Ez bi zimanê xwe dixwînim

Gelî hevalan, ez deh salî me, navê min jî Sîdar e û ez li Stenbolê hatime dinyayê. Ez ji Dêrika Çiyayê Mazî me. Ez bi zimanê xwe dixwînim û dinivîsînim.

Ez her hefte Welatê Me dikirim, pê hînî xwendin û nivîsandina zimanê xwe yê zikmakî dibim.

Ez dixwazim zarokên kurdan hemû hînî zimanê xwe yê zikmakî bibin. Gerek em Welatê Me bixwînin û bidin xwendin.

SÎDAR ÖZCAN

Kula zimên

Ez dimînim ecêbmayî ji van şîroveyên abes ên ku li ser hêjayiya zimanê kurdî tînin kirin. Ewên ku zimanê me yê xweş û dewlemend kêmer eyar dikin (dibînin), ya nizanin yan jî neyar in.

Ew tirkên ku dibêjin kurdî nizanîm tîrî çî nake, bi rastî kenê min bi wan tê. Lewra bi van gotinên xwe, zimanê xwe yê qels didine nasîn. Ewên ku karê wan wergêriya tirkî ye, vê qelsiyê baş dizanin û karê wan ji ber xizanî û qelsiya pirsan pir zor e. Ew pirsên ku (di zimanê tirkî de) hatine çêkirin jî, fonksiyona xwe bi tevayî temsîl nakin.

Em dikarin bibêjin ku ji bo çêkirina "xwarina zimanê kurdî" malzemyên wek ferheng, gra-

mer, pirtûk û hwd, bes in û di kûrahiya dîrokê de li hêviya nanpêjan e. Ew nanpêjên hunermend ên dewra Bedirxaniyan û berî wan, niha çûne ser heqîya xwe. Malûm e piştî wan, ji ber asimilasyonê bêperwa zimanê Bakûriyan bi zimanekî Ural-Altayî ya çêkirî û qels lewitiye û "bozilmîş bûye".

Bi rastî, rexneya birêz Rojhat Azadî ya li ser televizyona MED'ê ku di hejmarê 41' ya Welatê Me de derket, piçekî dilê min hênîk kir. Wekî ku tê zanîn, televizyon çêkek şerê giyanî yê giran e. Karpêkerê vê çekê divê bi hêz û bi qudret bin. Hêvîdar im ku rayedarên MED'ê, di demeke kurt de kêmasî û pirsgerêkên (arîşeyên) xwe yên zimên dê hel (çareser) bikin.

Di dawî de, heger dewleteke me hebûna û me ji bandorên bi zirarê biyaniyan parastibûna ev tişt nedihat serê me. Bêdewletiyê me kiriye vî halî.

ŞÎNASÎ ŞEN

Ziman, yek ji mercên netewebûnê û navê derûniya mirov. Ziman, benda li pêşiya tevgerên bişaftin û helandinê û movikên piştê ya neteweyê. Ziman, rengê ku pê gel ji hev tîn cihêkirin. Ziman, wasitayek e ji bo jihevîmkirinê.

Em çima van gotinan dibêjin? Sedemên wan hene.

Hemû zimanzan, zanyarên zimên eşkere dikin ku, her ziman xwediyê taybetiyan e, xwediyê qalib, riyên vegotinê û teswîran e. Ev yek jî bi qonaxa demê, mercên siruştî, têkiliyên hilberînê û dan û standinên celeb bi celeb pêk tê. Bi saya wan mirov ji hev tédigihîjin, hev serwest dikin.

Ez dixwazim der barê vê yekê de, bi alîkariya zimanê kurdî û tirkî du nimûneyan bidim. Kurd, gava ku yek bimire û pişt re bi qencî jê bê behskirin, ku wan gotinan heq

JI WELATÊ ME

ZANA FARQÎNÎ

Xemlên zimên

nekiribe, wiha dibêjin: "Keçel dimire porsor dibe." Tirk jî wiha dibêjin: "Kör ölür badem gözlü olur" (wergera wê ya peyv bi peyv: Kor dimire çavbehîv dibe).

Kurd dibêjin: "Min xwe li te girtiye." Tirk jî vê yekê wiha taswîr dikin: "Sana sığınmışım." Wergera wê peyv bi peyv wiha ye: Ez li te penihîme. Em dikarin zehf mînakên bidin, lê bi ya min jî bo tégihîştina mijarê ev bes in. Bi van jî cudahiya di navbera herduyan de diyar dibe

Xwendevanên me jî dikarin li gorî xwe, nivîsên di rojnameya me de derketine binirxînin, ka kîjan nivîs bi can û ruhê kurdî û qalib û riyên vegotina wê hatine nivîsîn.

Di nav hemû neteweyan de kesê ku zimanê xwe xweş û bi şeweyeke gramatikî bi kar tînin ên xwende, rewşenbîr, hunermend û hwd. in. Lê yê me ne wisan e. Gundiyên me, nexwendayên me çêtir bi zimanê xwe dikarin bipeyivin, xwe îfade bikin. Xwende, nivîskar û rewşenbîrên me

gava ku bi kurdî dinivîsîn û diaxivîn, qalib û taswîrên zimanê neteweya serdest bi kar tînin. Belkî kirasê kurdî li wan dikin jî, lê ruh û canê wan ne bi kurdî ye. Bêhtir ev yek jî li nav kesên ku ji bakurê welêt in, heye.

Ji ber vê yekê, ji bo ku mirov karibe zimanekî xweş û dirust bi kar bîne, divê ku mirov xwe bi zargotinên kurdî, gotinên pêşiyên û biwêjan zengîn bike. Bi gotineke din, divê mirov xwe hînî taybetiyên zimanê xwe bike û bi wan axaftin û nivîsên xwe bixemilîne.

Nîşe: Kesên ku xelata xaçepirsa me qezenc kirine, didine zanîn ku xelat neketine destên wan. Bêhtir jî kesên ku di girtîgehan de ne vê yekê diyar dikin. Em ji hemû kesên ku xelat qezenc kirine re, xelata wan dişînin navnîşana wan.

Cawa tê zanîn, birakujîya di navbera PDK'ê û YNK'ê de bi nehan ji rojevê derneket. Berpîrsê wê kî dibe bila bibe, bêguman ev birakujî dilê dostan dişikîne û dilê dijminan şad dike. Dibe ku îro hinek kêmasiyên di YNK'ê de hebin û berpîrsiya vê birakujîyê hinek jê jî, para YNK'ê bikeve. Lê berpîrsê wê yê esas û mezin PDK ye.

Lewre, birakujîya PDK'ê, îro bi YNK'ê tenê ve ne girêdayî ye. Gava ku em hindikek dakevine kûraniya dîrokê, dibînin ku ev birakujî zêdetirî bîst (20) salan e ku di navbera PDK'ê û tevgera kurd a cuda cuda de, dom dike. Ango ev ne birakujîya PDK'ê ya ewilî (yekemîn) ye, lê daxwaziya me ew e ku bibe ya

Daxwaziya gelê kurd û rewşa PDK'ê

dawî. Kuştina Dr. Şivan, birakujîya di navbera PDK'ê û RNK'ê (KUK) de, birakujîya di navbera PDK'ê û PDK'a rojhilat (Qasimlo), şerê navbera PDK'ê û PKK'ê de ku ji 1980'an heta îro didome û birakujîya navbera PDK'ê û YNK'ê ku îro jî dom dike. Dibe ku di vê birakujîya dema dirêj de kêmasî û berpîrsiyên tevgerên din jî hebin. Lê bêguman, kêmasî û berpîrsiya herî mezin a PDK'ê ye. Em dikarin bibêjin çî gav kîjan tevger dixwaze ji bo Kurdistanê xebat bike, ewilî li hemberî xwe PDK'ê dibîne. Heke bi zanatî û heke jî nezantî, ev polîtîkaya ku PDK'ê dide meşandin, bi kêrê

dijminê gelê kurd tê. Ji ber vê yekê girîng e ku em PDK'ê baş fêm bikin. Ji bo vê jî, hewce ye ku em îdeolojiya PDK'ê baş nas bikin.

Gava mirov van tiştan difikire du tiştên hişê mirovan, an PDK'ê van bi zanatî dike, an jî ji hêla siyasî ve pir xizan û belengaz e. Ji ber vê xizaniya xwe yê siyasî (polîtîk) jî, nikare xetek (xêzek) rast bide ber xwe. Çawa tê zanîn siyaseta PDK'ê her dem li gorî berjewendiyên Eşîra Berzanî hatiye birêvebirin. Lê îro gelê kurd baş dizane ku siyaseta li gorî berjewendiyên eşîrî, hêrêmî û grubî hatiye danîn, ji bo rizgariya gelê kurd û Kurdistanê nabe çare. Bêşik ev jî

pêşketineke gelekî mezin e. Tiştêkî dinê heye, girîng e ku gelê kurd li serê kûr bifikire. Têkiliyê PDK'ê û ya dewleta tirk a "dostanî". PDK'ê tu wext bi çavê dijminê gelê kurd li KT'ê nenihêrtiye. Lê KT jî, tu demê PDK'ê wekî dostekî xwe nedîtiye. Her dem wekî dost xwe daye nîşan û wekî dijmin ji paş ve û bi dizî li PDK'ê xistiye. Ji bo KT'ê ya girîng rawestandina têkoşîna gelê kurd a neteweyî ye. Lê çî mixabin PDK'ê heta îro jî rûçikê KT'ê ya rastîn nedîtiye, an jî naxwaze bibîne. Têkiliyên PDK'ê û dewleta tirk a "dostanî", îro dost jî dizane dijmin jî. Lê ev pêvajoya ku em tê de ne, ji her demê cudatir e. Lewre, gelê kurd

êdî ne birakujîyê dixwaze û ne jî siyaseta eşîrî diparêze. Li ser xaka xwe ne hêzêke ereb, ne jî faris dixwaze û ne jî leşkerê tirk. Ne bi êrîşên Sedam û Refsançanî qayil e û ne jî bi operasyona KT'ê. Daxwaza gelê kurd, welatekî serbixwe û jiyaneke azad e. Ji ber vê yekê jî du rêlî ber PDK'ê maye. An dê têkiliyê xwe bi dijminê gelê kurd re bidomîne, Kurdistanê pêşkêşî wan bike û gelê kurd jî nav derxîne, an jî wê daxwaz û berjewendiya gelê kurd a neteweyî bide ber çavan, eleqeya xwe jî dijminê gelê kurd bibire û dawî li birakujîyê bîne. Bi kurtasî, PDK an dê gelê kurd ji çav derxîne an jî dijminên gelê kurd.

SEYFETTİN ÖZCAN

FERHENGOK

Adetperest: Kesê ku bi erf û adetên xwe ve girêdayî ye	Mirovdewlet: Ew kesê ku di kar û barê dewletê de wezîfedar e (Devletadamî)
Ayende: Dahatû, pêşeroj (gelecek)	Nexweşnêr: Kesê ku li nexweşan dinêre (hastabakıcı)
Balafir: Teyare (uçak)	Nimînende: Nûner, niwîner, mumesîl (temsilci)
Balafirşkên: Çeka ku pê balafir tê qewirandin (uçaksavar)	Noqar: Noqav, keştiya binê avê (denizaltı)
Bombeavêj: Balafira ku bombe diavêje, ya bombardumanê	Parzemîn: Qita. (Welatê me li ser Parzemîna Asyayê ye)
Caxelas: Xelaskar, kesê ku mirovan xelas dike (cankurtaran)	Perav: Kersax, perên avê (kıyı)
Cewdik: Matereyê avê. (Di cewdikê şervan de her tim av heye)	Ronavêj: Projektor, aleta ku pê dever têne ronîkirin
Dahelandin: Daxistin. (Ji keştiyê flikayê dahelandin avê)	Serfermandar: Serkomutan
Fhembar: Tiştêkî ku jê bê fihemkirin	Sewgirandin: Temûnkirin, peydekirin
Gilî: Şikayet	Perestîj: Îbadet
Gilîvan: Şikayetvan	Tepisîn: Dewsandin
Guhêrbar: Tiştê ku diguhere (Değişken)	Vexwarbar: Tiştê ku tê vexwarin
Guhêzbar: Tiştê ku neqil dibe	Zirîç: Gule, risas
Kişwer: Nîştîman, welat	

AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me Divê

	Li Hundir	Li Derve
<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 1.000.000 TL	<input type="checkbox"/> 80 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.800.000 TL	<input type="checkbox"/> 150 DM

Li derve buhayê rojnameyê 3 DM e.

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkîyê – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

Li Derve – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV :
NAVNIŞAN :

Navnîşana Welatê Me
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel-Fax: 293 53 19 – 293 53 20

WELATÊ ME

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)

Aynur BOZKURT

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)

Zana FARQÎNÎ
Aynur BOZKURT
Sami TAN
Suut KILIÇ

Berpîrsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)

Metin AKSOY

NAVNIŞAN (Adres)
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
293 53 19 – 293 53 20

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ
(Temsilcilikler)
Çukurova– Salihê Kevirbirî
322-3597930
Suriye– Jan Dost
Fener Rojbiyanî

Berlin– Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69002695
Hannover– Selîm Biçûk
49-5721-81360

Hamburg– A.Hekim Gülsün
49-40-403388
Munchen– Mahmut Gergerlî
49-871-670884
Badenwürttemberg–
A. Rahîm Ayaz
49-75453258

Amsterdam– Cotyar Zaxoy
31-20-6130766
Paris– M.S. Aycîçek
33-1-48000401
Atîna– Ferhan Zêbarî
30-13634905
Bruksel– Medenî Ferho
32-16-490767
Stockholm–
Robîn Rewşen
46-8-7510564

'DEWLETA ALMAN Û TIRK ŞIRÎKÊ VÎ SÛCÎ NE'

Em ji serî heta dawiyê li dijî firotina çekan in. Em zanin ku ew çek çawa doh li dijî gelê kurd hatibû bikaranîn, wê sibê jî were bikaranîn. Îro dinya alem dizane ku patentên tanqên li Kurdistanê almanî ne. Îro ez ne şaş bim, di nav dewletan de piştî Suudî, dewleta Tirk di rêza duyemîn de ye, ji aliyê çekstandinê ve. Ev jî tengasiya dewletê dide xuyakirin. Piştî ku em herin Almanyayê, li dijî çekfirotina alman ji bo Tirkîyeyê emê kampanyayên xurt amade bikin. Emê bikevin nav xebateke anti-mîlîtarîst (dijî-leşkerî) ji bo ku em rûyê wan ê reş derînin holê. Tewra me ji bo îhlalkirina mafên mirovan, şewitandina gundan û înfazên bêdaraz jî eşkere ye. Partiya me PDS, ji bo mafên mirovan li tevahiya cîhanê bi cih bibe, xebatan dike. Ji ber vê yekê jî em dibin hedefên tacirên şer û kapîtalîstan.

Parlamentera PDS'ê Barbara Knöfler, ku bi cenazeyê Seyfettin Kalan re hatibû Edene-yê, pirsên Berpirsê me yê Çukurovayê bersivandin. Em vê hevpeyvîne pêşkêşî dêhn û bala we dikin.

Birêz Barbara Knöfler beriya her tiştî em dixwazin we nas bikin.

-Belê ez parlamentera Saksonyayê-Anhalt im, ji sala 1994'an û vir de ez parlementer im.

Çekfirotina dewleta alman ji bo Tirkîyeyê li holê ye, ew çek jî li Kurdistanê li dijî gelê kurd tê bikaranîn, partiya we PDS ji bo vê mijarê û îhlalkirina mafên mirovan, şewitandina gundan û înfazên bêdaraz çi difikire?

- Em ji serî heta dawiyê li dijî firotina çekan in. Em zanin ku ew çek çawa doh li dijî gelê kurd hatibû bikaranîn, wê sibê jî were bikaranîn. Îro dinya alem dizane ku patentên tanqên li Kurdistanê almanî ne. Îro ez ne şaş bim, di nav dewletan de piştî Suudî, dewleta Tirk di rêza duyemîn de ye, ji aliyê çekstandinê ve. Ev jî tengasiya dewletê dide xuyakirin. Piştî ku em herin Almanyayê, li dijî çekfirotina alman ji bo Tirkîyeyê emê kampanyayên xurt amade bikin. Emê bikevin nav xebateke anti-mîlîtarîst (dijî-leşkerî) ji bo ku em rûyê wan ê reş derînin holê. Tewra me ji bo îhlalkirina mafên mirovan, şewitandina gundan û înfazên bêdaraz jî eşkere ye. Partiya me PDS, ji bo mafên mirovan li tevahiya cîhanê bi cih bibe, xebatan dike. Ji ber vê yekê jî em dibin hedefên tacirên şer û kapîtalîstan.

Tewra Hikûmeta Helmut Kohl û Wezîrê Karê Hundirîn Manfred Kanter li dijî komeleyên kurdan li Almanyayê eşkere ye. Bi biryarên wan gelek kome-



Barbara Knöfler (Parlamentera PDS'ê ya Eyaleta Saksonyayê) û Bernd Lange (Endamê PDS'ê û rojnamevanê Gegengifte)

le bi navê "Terorîst" hatin girtin. Hûn vê yekê çawa dibînin û şirove dikin?

- Belê îro em dibînin ku Tirkîye û Almanya li dijî gelê kurd, rastiya kurd û destkeftiyên kurdan bûne yek. Ji ber vê yekê jî di sala dawî de gelek rêxistin û komeleyên kurdan bi awayekî anti-demokratîk hatin girtin. Piştî ku ev komele hatin girtin, gelê kurd ên li Almanyayê xwepêşdanên gelekî xurt li dar xistin, lê vê carê jî demaxeya terorîstî xwarin. Endamên wan komeleyan, wekî endamên PKK'ê dane xuyakirin û ew dane girtin. Hikûmeta alman dibêje "Ez ne alîgir im", lê belê ew alîgirê dewleta Tirkîyeyê ye. Vê gavê jî dixwaze ku gelê kurd ên ku di statûya penaberiyê de ye teslîmê dewleta tirk bike. Bi vî awayî dewle-

ta alman û tirk dibin şirîkê sûcên hev. Medyaya alman jî wekî medyaya Tirk alîgirê hikûmetê ye. Partiya me PDS, li dijî van polîtîkayên qirêj e. Komeleyên kurdan bi awayên demokratîk û prosedûrên nîzamî hatine saz kirin. Ev komele tu ar nabin komeleyên terorî. PDS heta dawiyê wê li cem wan komeleyan cihê xwe yê dostî bigire.

Di 3'ê rezberê de, li Neuhunstera Elmanyayê, xortekî welatparêz bi navê Seyfettin Kalan ji hêla tirkên Faşîst ve hate qetilkirin. Hûn jî ji ber ku di cenazeyê de astengî dernekevin, hatin Edene-yê. Ji roja şehîdbûna Seyfettin heta îro, li dijî tewra dewletê nêrînen we çawa ne? - Ji roja şehîdbûnê heta îro, ji hêla Enqereyê ve gelek astengî der-

ketin holê. Cenaze jî 10 rojî zêdetir li Almanyayê ma. Astengiyên bürokratîk xistin pêşiya me. Lê ji ber tewra dewleta alman û Hikûmeta Tirkîyeyê, birayê Seyfettin Kalan, Ali Kalan got ku "Ez her tiştî emanetî we parlementeran û parêzeran dikim", ji ber vê yekê jî em ketin dewrê û em bi cenaze re hatin heta Stenbolê. Lê dewletê bihîst ku emê serê sibê cenaze bibin Edene-yê, beriya me cenaze derve Edene-yê. Ji ber ku kes pê nehise. Lê îro me bihîst ku gelê kurd li şehîdê xwe xwedî derketiye.

Wekî tê zanîn, piştî yekîtiya CHP û SHP'ê endamtiya SHP'ê ya di Înternasyonal Sosyalîstê de ket. Di vê merhaleyê de jî, ji bo endamtiya Înternasyonal Sosyalîstê serîlêdana HA-

DEP'ê li Îspanyayê çêbû, hûn der heqê vê yekê de bi çavekî çawa li HADEP'ê dinêrin?

- Em serîlêdana HADEP'ê di cih de dibînin. Emê piştgirî û alîkariya xwe bidin HADEP'ê. Di tevahiya Almanyayê de jî, ez bawer im ku wê HADEP piştgirî bibîne, ji ber ku doh SHP ne la-yîqê saziya Înternasyonalê bû, îro jî serîlêdana CHP'ê li ber çavê me ne bi qedir û qîmet e. Îro her kes dizane ku li Kurdistanê qetlîamê tê kirin. Ev qetlîam li ber çavê hikûmetê dibe, tiliya hikûmetê jî di vê qetlîamê de heye. Îcar werin bifikirin; şirîkê vê hikûmetê kî ye? CHP ye. Ji ber ku îro CHP şirîkê ve koalîsyonê ye, şirîkên van qetlîaman e jî. Ji ber vê yekê jî rûmeta serîlêdana HADEP'ê ji ya CHP'ê, qat bi qat zêde ye. Em bawer in wê HADEP serfiraz bibe.

Tê zanîn ku partiya we PDS, li rojhilat Almanyayê gelekî xurt e. Lê belê em vê yekê nikarin ji bo rojavayê Almanyayê bibêjin. Hûn vê nêrîne çawa dinirxînin?

- Rast e! Partiya me PDS li rojhilat gelek xurt e, lê belê wekî we got em vê nêrîne nikarin ji bo rojava bibêjin. Sedema vê yekê jî ev e ku li rojava herdem partiyên kapîtalîst xurt in, ji ber ku li rojavayê Almanyayê şexsiyetekî (kesîtî) egoîst heye. Îro di meclîsa Federalî de 40 parlementerên me hene. Ango em reqemêkî îstatîstîkî derînin holê, em dikarin bibêjin: Qeweta Partiya me PDS li rojhilat %17, lê li rojava ev hêjmar dikeve û dibe % 0.3.

Birêz Barbara Knöfler ji bo vê sohbetê em ji we re spas dikin.

- Ez spas dikim. Ji îro û pê ve Rojnameya Welatê Me bikeve destê min ezê pir kêfxweş bibim

HEVPEYVÎN:
SALIHÊ KEVIRBIRÎ